

# welat

Nameyek  
ji keçên Kurd  
ên evîndarên  
serxwebûnê re



Rûpel 14

Sal:2 Hejmar:100 16-22 Rêbendan 1994 10.000TL (KDVD) Rojnameya Hefteyî

Rayedar, rêveber û mebûsên DEP'ê hilbijartinên 27'ê Adarê ji Welat re nirxandin:

## 'Qedera hilbijartinê li Kurdistanê ye'



- Heke şertên hilbijartineke demokratîk neyên temînkirin, DEP wê jê vekîşe
- Li Stenbolê DEP difikire ku wê serokatiya 5-6 belediyên di hilbijartinan de bi dest bixe
- DEP'ê texmîn dikin ku wê li Tirkîye û Kurdistanê %10 ray bistînin
- Ji bo berendamîya serokatiya belediyên li şertê Kurd an Tirkbûnê nayê gerîn
- Li herêmê û li Tirkîyeyê îtişaq bi tu partiyeke dewletê re nayê kirin
- Ji bo berendamîyên li şertên "naskiribûn" û "qebûlkiribûnê" tê gerîn
- Dewlet ji bo tengkirina çepera li dora DEP'ê, di kefteleştê de ye
- Partiyên sistemê li Kurdistanê ji aliyê dîtina berendamîyan ve, di tengasiyê de ne
- Di hilbijartinan de ihtimal heye ku hîle û dek bêne kirin
- Hilbijartina ku DEP nekevê wek nemeşrû tê nirxandin
- Qedera hilbijartina 27'ê Adarê, li Kurdistanê diyar dibe

Rûpel 8



Cinayetên li dijî  
mirovahiyê

Rûpel 12



Li kuçeyên Stenbolê  
gedeyekî stûxwar

Rûpel 10

Bangek ji bo Serokê Ayîniya Mesîhiyeta Cîhanê

# Hiz. Îsa jî wê ev zilm nepejiranda

Serokê hêja Papayê bi rûmet! Em pîrozbahîya civata we ya ruhanî dikin. Bi bîrhatina 1994 saliya bîna Hezretî Îsa eleyhî selam. Em daxwaza serketin û serfiraziyê ji bo civata Ruhaniya Mesîhiyeta Cîhanê dikin. Wek hûn dizanin, di Kurdistana dagirkirî de, ji hêla Cuntaya Tirk ve çawa dewlemendiyên sererd û binerd tîn talankirin, gund û bajarên Kurdên mesîhî û misilman tîn xerakirin û şewitandin. Namûs û şeref li ber lingan diçin. Wilo ayîniya îslamî û mesîhî jî di bin piyên neviyên Sultan Abdulhemîdê Sor de diperçiqin. Ewê ku di dîrokê de destên wan sor bûn bi xwîna Kurdên mesîhî û misilman. Niha jî zarokên Kurdên mesîhî û misilman di bin panzêrên dewletên mesîhî de tîn perçiqandin. Gund û bajar bi top û balafirên wan tîn şewitandin. Qirkirina Kurdên mesîhî û misilman bi destûra wan serokan tîn kirin, ewên ku

destên xwe danîn li ser Încîla muqedes û ji bo parastina mafên mirovan sond xwarin. Em wek Wecîba Cîvata Ruhaniyê dibînin ku li dijî vê zilmê derkeve, lewre Hezretî Mesîh eleyhî selam di Încîla Şerîf de ferman kiriye. "Wan tiştan hûn li ser xakê girê bidin, min li asîman, qebûl nekirine." Em bawer in heke Hezretî Mesîh li ser xaka zemîn bûya wê ji bo şewitandina pîr û zarokên Kurdên mesîhî û misilman erd û asîman bihejanda. Hêvî ev e, hûn bi wekaleta mesîhî li dijî kuştin û zilma rejîma Tirk dengê xwe bilind bikin. Em bawer in hûn bi navê Cîvata Ruhaniyê ji bo gelê Kurdî mezlûm û bindest alîkariyê bikin. Bi rêz û silavên dayik û bavên zarokên bîst parastin dibin êrişa napalmê. Sersala we pîroz dikin.

**Serokatiya Ayîniya Kurdistana Serbixwe**

## Jiyîn

Heta beyana şevên bêheyv  
Li hev parvekirina berbanga kolanan e.  
Û di destên hêviyê  
Yên qewardayî de  
Li ser dilê xwişk û biratiyê  
Yên biçûk  
Ji bo şagirtan  
Evîn ristine.  
Jiyîn,  
Li karistanan kedkarî,  
Li qada şer şerkarî,  
Rik li zordaran girê dane.  
Û li ser xaka ku agir lê dibare  
Di çavê dijmin de tawanbarî ye  
Li wir, li ser çiyayê Mamikan  
Serî hildane.

**Çîna Karkeran  
Pirrîn (Adiyaman)**

## Welat mizgîn

Ey Kurdistan, welat mizgîn  
Ev serhildan, serketin  
Ala kesk û sor û zer li dar xin  
Me şerê xwe rakirine  
Em şîna xwe, şer dajone  
Heta ku hebek mabe  
Mirin ji me re zêr e  
Em nabin êsirê wan e  
Xwelî av dan bi xwîne  
Gelê me şerê xwe dike  
Ji bo evîna Kurdistanê  
Me şerê xwe rakiriyê  
Kurdistana me bi dewran e  
Gişt bi hev re pişt dane  
Bila bigirin ew zilimkar  
Me şerê xwe rakiriyê

**Xortê Şivan Alî Şîrîn  
Ji Xolxala Çepêkçûrê (Bingolê)**



**Keça me Niwa  
3 saliya te  
pîroz be.**

Dê û bavê Niwa  
Nezîhe û Bedran

## Ji xwendevanên Welat re!

Nivîsên ku hûn ji Welat re dişînin, ji kere-  
ma xwe re bi awayekî wisa binivîsên ku  
dikaribin bêne xwendin û rastkirin. Ger  
hûn navnîşan an jî telefonên xwe jî di bin  
nivîsên xwe de bidin diyarkirin emê  
kêfxweş bibin. Bîmînin di xweşiyê de

**Redaksiyona  
Rojnameya Welat**

## Nivîsara Welat

### 100 hejmarên xwerû bi Kurdî

**W**elat gihîste hejmara xwe ya 100. Rojnameya me ji xeynî hejmara 95. ku polîsan li montajê dest danîbû ser, bêrawestîna 100 hefte li pey xwe hiştin. Li welatekî azad û bi zimanekî negirêdayî yê ku bi awayekî fermî di sazîyên dewleta wî welatî de tê bikaranîn, derxistina rojnameyê hefteyî karekî normal û xwezahî ye. Bes dema ev rojname bi Kurdî be û navenda wê jî li bajarekî dewleteke dagirker be, hingê derxistina weşaneke hefteyî li aliyekî, ya yeke mehane jî karekî pirr dijwar e. Ev rastî dema li ber çavan tîn girtin, tê dîtin ku bi rêk û pêk û bêrawestîna weşandina rojnameyê hefteyî bi serê xwe bûyereke dîrokî ye. Pêwîst nake em dijwarî û tengasiyên ku di pêvajoya sed hefteyan de me dîtine yek yek di vî quncikî de binivîsin. Em bawer in ku xwendevanên Welatê vî yekê jixwe baş dizanin. Lê dîsa jî li ser armanc û xebatên xwe yê 100 hefteyan em dixwazin çend gotinan bibêjin.

Ji destpêka derçûna Welat ta niha, hewldana Welat ew bû ku bibe dengê gelê Kurdî ê têkoşerê azadiyê, bibe platforma nêrîn û guftûgoyên li ser pîrsgirêkên civaka Kurdî û têkoşîna wê ya neteweyî, bibe berhevoka nîrxên Kurdistanê yê çandî, hunerî, wêjeyî, bibe navgîna pêşvebirin, tîkûzkirin û yekîtiya zimanê Kurdî, bibe bin-geheke zexim ji bo pêkanîna damezirîna rojnamegeriya Kurdî ya hemdem, bi kurtasî bibe rojnameyê-ke neteweyî ya ku tê de hemû Kurdên welatparêz û dostên wan ên pêşverû dengê xwe bilind bikin û berhemên xwe yê hêja bidin pêşkêşkirin.

**Ji perwerdekirina zarokên Kurdan -ku bê dibistan in- bigirin ta bilêvkirina pîrsgirêkên jinên Kurd ên belengaz û ji li berçavanraxistina şertên ku gerilayên doza Kurdistanê tê de dijîn bigirin ta nîrxandin û rexnekirina rewşa penaber û koçberên Kurd ên Tîrkiye û Ewropayê, li ser gelek mijarên girîng, cihêreng û balkêş, Welat hewl da ku xwendevanên xwe agahdar bike.**

Bi vî armancê, Welat pêvajoya 100 hefteyan xwest û xwe ceriband ku bibe xwedî rolekî pirralî. Ji hînkirina xwendin û nivîsandinê bigirin ta pêkanîna rastnivîs û rêzîmaneke rast û hevgerî, ji danasîna nivîskar, helbestvan, hunermend, şexsiyetên dîrokî yê ji çar parçeyên Kurdistanê ta danasîna erdnîgar, dîrok û her cure bermahiyên welatê Kurdan, ji perwerdekirina zarokên Kurdan -ku bê dibistan in- bigirin ta bilêvkirina pîrsgirêkên jinên Kurd ên belengaz û ji li ber çavan raxistina şertên ku gerilayên doza Kurdistanê tê de dijîn bigirin ta nîrxandin û rexnekirina rewşa penaber û koçberên Kurd ên Tîrkiye û Ewropayê, li ser gelek mijarên girîng, cihêreng û balkêş, Welat hewl da ku xwendevanên xwe agahdar bike, dîtinên wan bistîne û biweşîne di nav rûpelên xwe de. Tiştên me li jor anîm zimên armanc, hewldan û ceribandînan me bûn.

Em çiqas bi ser ketine di van ceribandînan û pêkanînan xwe de, nîrxandina wê jî, ji xwendevanên xwe re dihêlin. Lê tevî hemû kêmasî û çewtiyên xwe bi gihîştina hejmara xwe ya sedemîn em pirr şanaz û dilşad in.

Armanc û hêviya me ye ku di pêş de bi saya rexneyên xwendevanên xwe, Welat xurtir û bedewtir bikin.

### BELAVKIRIN

Heftaya din, me behs kiribû ku nema şirketa BBD'ê Welat belav dike. Mixabin ev rewş wê ta çend mehên din bidome, ji ber vê yekê jî wê Welat negihîje hemû deveran. Kesên ku dixwazin di belavkirinê de bi me re bibin alîkar ji kerema xwe re bila bi me re bikevin tîkiliyê. Wêkî din xwendevanên ku nikarin Welat bi dest bixin, ger li telefona ku em li jêr didin bigerin, emê karibin riya bidestxistinê nîşanî wan bidin. Telefon û faxa me: 5115007. Mixabin ji ber ku gelek caran em mecbûr man cihê xwe biguherînin, telefonên me jî îptal dibin û xwendevanên me bi hêsanî nedikarin xwe bigihîjin me. Bes ji vî gavê pê ve ev telefon (fax) a me wê bixebite.

Mazhar Günbat

.....NÛÇEYÊN CENGÊ.....

# Metodên Hîtler

## Navenda Nûçeyan-

**5 Rêbendan 1994-** Minibûsek ku ji Licê diçû Amedê, li nêzî Qereqola Engûlê ji hêla leşkeran ve hate gulebarankirin. 5 rêwî mirin, 10 jî birîndar bûn. Leşkeran êrîş bir ser gundê Engûlê û gund da ber topan, zarokêk mir û du gundî jî birîndar bûn. Di êrîşê de 9 mal hatin şewitandin û du gundî jî hatin binçavkirin.

Cerdevanên Eşîra Bûcakan (sîwerek), li Wêranşarê sê kes revandin û îşkence bi wan kirin. Ji van kesên revandî (Faîk Kevçî û Şevket Geçgel) Mûsa Cîn hat in berdan.

Li gundên navçeya Kanîreşê (Karliova), leşker dixwazin bi zorê gundiyan bikin cerdevan. Ji bo vê yekê der dora gundê Kanîyan, Bûban, Cafran, Axpîk û Soloderesî ji hêla hêzên dewletê ve tê bombekirin.

Li Amedê hin kesên nenas, êrîş birin ser dikanan, Hamza Dûman hate kuştin, Bayram Yeşîl û M. Salîh Gîzîlî jî birîndar bûn.

**6 Rêbendan 1994-** Li Batmanê, kontreya 3 kes bi navê Şîrîn Rûzgar û lawê wî A. Halîm Rûzgar û xebatkar Emîn Kahraman, kuştin. Li Amedê, di Razangeha Zanîstgeha Dîcleyê de, di nav bera xwendekaran de şer derket, 9 xwendekar birîndar bûn. Şer di nav bera du komên tevgera Hizbullah de çêbû.

Li Amedê panzerek leşkerî, li Taxa Bağlarê, li jinekê qelîbî û di bûyerê de Melek Adigûzel di cih de mir.

Serokê Belediyeyê, yê nihiyeya Comanîyê (Atabağ Baykan) Ekrem Canpolat, ji hêla hêzên emniyetê ve hate binçavkirin. Canpolat ji Partiya DYP'ê ye û bi sîwecê alîkariya bi PKK'ê re hatiye binçavkirin.

Li Giyadînê (Diyadin) hêzên dewletê 13 gundî binçav kirin. Ji van ên ku navê wan kifş bûne ev in: Mehmet Kayalı, Paşa Bîrgül û Cahît Yaşlı.

Ji hêla din, li gundên Elbîstanê hêzên dewletê gelek gundî binçav kirin. Tu agahî ji kesên binçavde ne tune, ji ber ku gund (Çiftlik, Kîstîk û Akdîl) di bin gemaroya hêzên leşkerî de ne.

Hêzên leşkerî girtin ser 5 gundê Tûxê (Tetwan) û ji wan 2 gund şewitandin. Hêzên leşkerî gundê bi navê Ez û Vanîk ewilî vala kirin û dû re jî şewitandin.

**7 Rêbendan 1994-** Li Cizîrê hêzên leşkerî Taxa Sûr û ya Cûdî dan ber topan. 3 kes mirin, 4 jî birîndar bûn. Di bombe barandinê de, M.Emîn Katmîş, jina wî Mûmîne û lawê wan Alî Katmîş mir. Hohê, Mele İsmâîl, Yusuf, Lokman û Osman Tetik jî birîndar bûn.

Li Şîrnexê artêşa taybetî ket

■ Artêşa Tirk, Kurdîstaneke vala ji xwe re kiriyê armaceke bingehîn. Êdî ji ber êrîşên gerîla hêzên leşkerî, alîkariyê ji gundiyan dixwazin, da ku gundî, di nav wan û gerîla de nabêntiyê bikin. Û ji gerîla re bibêjin êrîşa nebin ser hêzên leşkerî. Neçariya leşkeran, dibe bela serê gundiyan reben. Artêşa Taybetî jî, xwe li Kurdistanê diceribîne. Vê artêşê di êrîşa PKK'ê de 15 leşker winda kirin û bi vê hersê, gundiyan Şîrnex û Sêrtê dane ber guleyan. Lê di çapemeniya Tirkîyê de ev kuştîyan (25 kes) wek gerîlayên PKK, hat rêdan. Welê tê xuya kirin ku metodên artêşa Tirk, metodên Hitler wê li dû xwe bihêle.

kemîna hêzên gerîla, 11 leşker mir 4 leşker jî hatin dilkirin.

Li Pîrsûsê (Sîrûc) di navbera hêzên leşkerî û yên PKK'ê de şer derket. Li gorî agahiyan 6 gerîla mirine.

Li Xelîla gundê Kerboranê (Dargeçît) 20 gundiyan ku ji aliyê hêzên dewletê ve hatibûn binçavkirin, ji wan 16 gundî hatin berdan. Lê 4 kes hîn jî winda ne.

Ji Bîrika gundê Bismilê Üzeyîr Kurt ji hêla hêzên dewletê ve 2 roj berê hate binçavkirin û heta îro jî hay jê tune.

**8 Rêbendan 1994-** Gundê Mebûsê DEP'ê Nîzametîn Toğuş Gîrdîkan, ji hêla hêzên dewletê ve tê valakirin. Hêzên dewletê, gundî bi kuştînhê tehdît kirin û 6 mal jî şewitandin.

Hêzên dewletê Hênê (Hanî) dan ber guleyan. Piştî gulebarandinê hêzên dewletê derketina ji malan qedexe kirin.

Li Misîrcê (Kurtalan) panzera leşkerî li mayînhê qelîbî, 7 leşker mirin, 3 leşker jî birîndar bûn.

Hêzên ARGK'ê li Qoserê (Kiziltepe) Taxa Cumhuriyetê êrîşî minîbusa polîsan kir, 2 tîmên taybetî mirin.

Li Çokpînar gundê Semsûrê (Adiyaman) hêzên ARGK'ê alîkarê dewletê (ajan) Hüseyîn Arîk kuştin.

Cerdevanên Norşê gundê Mûşê xelk dan ber guleyan. Di gulebarandinê de keçîkek 8 salî birîndar bû.

**9 Rêbendan 1994-** Hêzên ARGK'ê li Şîrnexê êrîşî artêşa taybetî kirin, 15 leşker mirin, gelek leşker jî birîndar bûn. Dîsa li Şîrnexê qemyonekê li mayînhê qelîbî, Cemîl İbûr û Sûphî Erdem mirin, du kes jî birîndar bûn.

Li Silopî hêzên leşkerî dest bi operasyonan kirin, heta vê gavê 150 kes hatin binçavkirin.

19 kes ji aliyê leşker û tîmên taybetî ve li Midyadê, Gevre (Yüksekova) û Xabûrê hatin binçavkirin, ta niha tu agahî der heqê wan de nehatiye standin.

**10 Rêbendan 1994-**

Gundê Licê Bamîtnê, Sîsê û Dêrxust ji hêla hêzên dewletê ve hatin şewitandin. Di her sê gunda de 50 mal bi temamî şewitîne, yên mayî jî lê nayê rûniştin. Hêzên dewletê 5 gundî jî binçav kirin.

Li gundê Nîsêbînê hêzên dewletê êrîş bir ser gundiyan û gelek mal şewitandin. Gundiyan Bizgurê, Telatê, Serêkaniyayê, Çalê, Cinetamiho, Cinetahîso û Çîbilgirawê, ji aliyê hêzên dewletê ve bi kuştînhê hatin tehdîtîkirin, da ku ew gundê xwe vala bikin.

Li Cizîrê leşkeran Taxa Cûdî û Sûr bombebaran kirin. Di bomberandinê de, ji eynî malê 6 kes, Ramazan, Sabîha (Bûk), Sabîha (qîza malê), Hediye, Muhammed û Ahmed Bilgîç mirin, 6 kes jî birîndar bûn.

Artêşa taybetî li gundê Dihê (Eruh) û Banê (Güçlükonak) gelek gundî kuştin. Heta vê gavê cendekê 3 gundiyan gihîştîya Nexweşxaneyê Sêrtê.

10 gundên Aralikê (.....) di bin gemaroya (eblûka) hêzên dewletê de ye.

Endamên DEP'a Erxenê Bîşar Şener û du lawê wî (Wedat û Zafer) ji aleyê hêzên ewlekariyêve hate binçavkirin.

**11 Rêbendan 1994-** Leşkeran gundê Licê, Goma Arîfbeg, Goma Bekiran, Mala Elîkan û Dehlîlo şewitandin.

Hêzên gerîla, pira ser rêya Sêrt û Batman bi hewa xistin. Piştî bûyerê 6 kes, ji gundê Awîskê hatin binçavkirin.

Li Batmanê xebatkarê TAP-O'ê (Şîrikatiya Anonîm a Petrolên Tirkîyeyê) İsa Özer û kesek bi navê Feyrûşah Saçan, ji aliyêkesên nenas ve hatin kuştin.

Hêzên nenas li Amedê Firat Doğan kuştin.

Di operasyonên hêzên leşkerî de 20 kes li Hênê (Hanî) hatin binçav kirin.

Navenda DEP'a Licê, ji aliyê hêzên dewletê ve hate gulebaran kirin. Piştî gulebarandinê 16 kes ji bo vê bûyerê hatine binçavkirin.

# HAWAR

Dilbixwîn

## Nûrheq û hozan Besê

**J**ina Kurd, êdî weke jineke bêmaf, bêçare, bêkar û bêxwedî li xwe nameyzîne. Bêguman jin, ne tenê ji bo nan û zarokçêkirinê ne, ne tenê ji bo reşgirêdan û şîngerandinê ne. Heke berê jina Kurd bi navê nezaniyê, birtengiyê û bêhişiyê dihate naskirin, niha ew bi pratîka xwe wan nêrinên kevneperest bêwate dihêle.

Di nava civakan de civaka Kurd û di nava civaka Kurd de jî, jina Kurd; ji her kesekî bêhtir êşa bîndestiyê kişandîye, lewma gelek caran tê gotin, jin koleyê koleyan e.

Gelê Kurd ji xwe re rîya jîyanê vekiriyê. Ji nû ve biyografîya xwe dinivîsîne, pênuşa di destê wî de ya wê ye. Êdî hew dikare di bin konê mirinê de binale û can bide. Neçare li hemberî wê mirina ku jê re bûye qedêr (çarenûs) diwarên azadiyê ava bike û li kêleka wan diwaran jîyan û hebûna xwe biparêze. Ne tenê mêrê Kurd, bi meş û kerwanê azadiyê re jina Kurd jî xwe diparêze û pêş ve diçe. Di pratîkê de cihê xwe digire, aliyekî xebata ramiyarî, sosyalî, wêjeyî, kulturî, hunerî û li aliyê din jî di nava şerê germ de berpirsiyariya herî bilind hildigire û dibe serok.

**Gelê Kurd ji xwe re rîya jîyanê vekiriyê. Ji nû ve biyografîya xwe dinivîsîne, pênuşa di destê wî de ya wê ye. Êdî hew dikare di bin konê mirinê de binale û can bide. Neçare li hemberî wê mirina ku jê re bûye qedêr (çarenûs) diwarên azadiyê ava bike û li kêleka wan diwaran jîyan û hebûna xwe biparêze. Ne tenê mêrê Kurd, bi meş û kerwanê azadiyê re jina Kurd jî xwe diparêze û pêş ve diçe.**

Kin were gotin jina Kurd, a ku dîrokê li ser eniya wê "kole" nivisandibû, niha serok e, hunermend e, torevan e, şanoger e, sosyolog e (civaknas) û Kurdo-log e...

Mijara vê koşeyê ne lêkolîneke dîrokî ye, li ser jina Kurd... Mebesta min "Nûrheq" e.

Ji hêla Weşanên Hunerkomê ve (49), kasete Nûrheqê ya Hozan Besê derket. Li herdu aliyên kasetê 14 stran hene. Gotin ji hêla H. Sefqan û vê Hozanê ve hatine amadekirin. Muzîka kasetê Besê çêkirîye.

Di kasetê de hevala Besê hem muzîsyen, hem helbestvan û hem jî dengbêj e. Mirov bi vê yekê gelekî şanaz e. Êdî jina Kurd dikare bi xwe rabe ser piyan û bi xwe jî bimeşe.

Besê weke hozaneke gelî tê naskirin. Hozana gel e, dikare hestên gel nas bike, bi êşa wan bihese û di şîn û şahiyên de bi wan re be. Bi rastî dema ku min Besê di serhildana Kasselê de dît, ez gelekî kêfxweş bûm. Di nava gel de bû. Bi gel re radibû, bi gel re rûdinişt. Hozanê(a) gel di nava gel de ye, hozanê(a) jî gel dîr, hunera wî miriyê, bêcan e.

Huner bi xwe berhemeke kolektîv e (hevpar, hevpişk). Encama keftûlefteke hevbeş e. Stûnên hunerê hev temam dikin, wisa jî di kaseteke muzîkê de beşên bingehîn di amadekirina wê de ev in: Gotin, muzîk, amûrên muzîkî, deng (aheng), moral, form û psikolojiya dengbêj. Heke em bala xwe nedin van pêdiviyên, bêguman berhema em pêşkêş bikin wê lawaz bibe.

Li gorî ku ez tédigihîjim, li ser kasetê gelekî nehatiye rawestandî, psikolojî û morala hozan li ser enstrumental û ahengê ne destelat bûye. Di navbera muzîk û gotin û deng de tékiliyeyeke tunde nîn e.

Di straneke de ahenga neteweyî gelekî pêwîst e. Eger amadekarê muzîkê û belavkarê enstrumentalan êş û hesta dengbêj nas neke ew nikare muzîkeke rêk û pêk pêşkêş bike. Amûran (aletan) bersiva gotinan nedane. Lewma jî guhdar cudabûn û qutbûnekê di navbera gotin û muzîkê de dibînin.

## Navê Sûriyeyê hîn "terorîst" e!

Di gel ewqas çûn û hatina heyetên DYA'yê û hevdiîtina Esad û Clinton, ku hefteya li pêşiya me, wê li Cenovayê çê bibe. Dîsa jî rêveberên DYA'yê (Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê) navê Suriyeyê jî nav listeya dewletên terorîst dernaxe.

Berdevkê Karê Dewletê yê DYA'yê Mike McCurry, ev daxuyan kir: "Suriye wê di nav listeya dewletên bi terore re têkildar de binîne heta ku wê dev ji alîkarî û parêzkariya rêxistinî terorîst berdaye." Dîsa McCurry daxuyand ku wê Clinton di hevdiîtinê de giraniyê bide ser pêkanîna aştîyê ya di navbera Suriyeyê û Îsraîlê de.

Niha navê 7 dewletan di vê listeyê de cih girtiye. Dewletên ku di vê listeyê de bin, bi ambargoya DYA'yê ya aborî re rû bi rû dibin.

Li aliyê din, Wezîrê Karê Derve yê Suriyeyê daxuyand ku, heke kî li dijî peymanê RRF'ê û Îsraîlê şer bike wê Suriye alîkariya wî bike.

## Çeteyên mafya 40.000 şirketan kontrol dikin

Cîgirê Wezîrê Karê Hundirîn, Mikhaîl Yegonov, di semînerêke navneteweyî de daxuyand ku, rêxistinên mafya li Rûsyayê 40.000 firmayên (çî arîzî, çî yên dewletê) kontrol dikin. Van şirketên cur be cur jî bo karê qirêjî weke, bazirganiya çekan, tiştên tevîzîne (narkotîk) û erebeyên dizî dikin.

Di semînera bi navê "Karûbarê Dilovan" de Yegonov got ku, li hinek herêmên Rusyayê ev kes, pîrr bi jîrî û serkeftî, kontrola kar bi dest dixine. Hêzên ewlekarî dibêjin ku, gelek mirovên mafya cihên girîng di 1800 bankeyên ku, baş nayêne birêvebirin de, bi dest xistine, gelek grubên mafya, xebatên xwe yên qirêjî, bi kontrolkirina şirketên ku, karê bi rûmet dikin, vedîşêrin.

## Aîdîd dîsa bû serok

Muhamed Farah Aîdîd jî nû ve hate hilbijartin jî bo Serokatiya (SNA) Hevkariya Neteweyî ya Somaliyê pêk tê. Li gorî agahiyên ku rayedarê rêxistinê roja 5'ê Rêbendanê dan, Aîdîd ku niha li Kenyayê ye. Di hilbijartina ku roja 4'ê Rêbendanê li Mogadîshiyê, bi beşdariya 200 giregirên hevkarîyê de, Aîdîd jî bo şer mehan, wek serok hate hilbijartin.

Abdî Kerîm Serokê Kongreyê jî Ajansa Reuters'ê re wiha got: "Ev hilbijartin nîşana piştgiriyê ye jî bo mirovekî ku li dijî hêzên NY'yê şerê gerlatiyê meşandiye."

Li Meksîkayê di navbera ARNZ û dewletê de destpêka pêvajoyek nû

# Artêşa Zapata şerrawestî xwest

**Nûçeyên Derve-** Artêşa Rizgariya Neteweyî ya Zapata (ARNZ) roja 11'ê Rêbendanê (Çile), di gel hinek şertan, pêşniyara şerrawestîne pêşkêşî hikûmetê kir. Li gorî Ajansa Reuter'ê, ARNZ dixwaze wek aliyekî şer bê nasîn. Artêşa Meksîkayê jî herêma şer vekîşe, piştî wan, dikarin dest bi hevdiîtinê jî bo aştîyê bikin.

Serokê Meksîkayê Carlos Salinas de Gotarî, Wezîrê Karê Hundirîn, jî ser kar dîr xist û Wezîrê Karê Derve yê jî bo pêkanîna aştîyê peywirdar kir. Bi Serokatiya Manuel Camacho Solís Lijneya Aştîyê ava kir.

Li aliyê din şerê ku, li herêma (dewleta herêmî) Chiapas roja serê salê dest pê kir, piştî demê ber bi çiyên ve vekîşt, bi vekîştina gerîlayan re. Lê, bi bombekirina hinek avahiyê li Meksîco Cîty berfirehtir bû. Di rojên dawîya hefteyê de li 5 derên Meksîco Cîty'ê bombe teqiyên, jî bilî jineke ku birîndar bû, tu tişt bi kesî nehat.

Ëvara serê salê gundiyan xwecih li dijî dewleta Meksîkî li herêma Chiapas (dewleta federal) serî hildabûn û li wê herêmê, jî bo demêke rêveberî bi dest xistibûn, lê piştî şerekî gurr, vekîştîya bûn çiyên. Di vî şerî de nêzî 200 kesî hatin kuştin.

Ev herêm cihê herî xizan î xwecihên nêviyê şaristaniya Maya ye.

Dewleta Meksîkî piştî ku ew nefî wê herêmê kirin, (25 salan berê) tim bi tenê, jî hemû pêşketinan bêpar hiştine. Hejmara xwecihan li vê herêmê 3.2 milyon e û ev jî digihîje jî sedî 50 zêdetir nifûsa herêmê. Li wir hikûmdarî di destê çend xwediyê plantasyonan de ye ku, bi alîkariya Partiya Salinas (Partiya Şoreşger a Saziyê) jî gundiyan erdê wan distînin, di ser de jî zilmê li wan dikin (dikujin, diavêjin hepsê). Rêjeye Meksîkiyan li wê herêmê jî sedî 4 e, lê ev xwediyê çar yek gişt erdên herêmê ne.


Li gorî jêderên navneteweyî, di bin Serokatiya Salinas de, dewlemend hîn dewlemendtir, xizan jî xizantir bûne.

Wek tê zanîn, serhildêran armanca xwe wek parastina

■ Mêjûya avabûna ARNZ'ê digihîje sala 1968'an ku li Meksîco Cîty'yê gelek xwendekarên ku, hikûmet protesto dikirin hatin kuştin. Ji sala 1983'yan vir ve li çiyayên Chiapasê amadekariya şerê çekdarî dikin. Di gel xerabûna rewşa aborî û siyasî ya xwecihên herêmê û penaberên ku ji Guatemalayê hatin, hêza Zapatîstan jî zêde bû.

mafên xwecihan û rê li ber girtina NAFTA'yê ku piştî serê salê kete rojevê, jî ber ku, piştî peymanê NAFTA'yê (Peymana Bazarganiya Azad ya Bakurê Amerîkayê) wê hilberiyê wan, hîn erzan jî dest biçe û wê têkevin tengasiyêke mezin. Li gorî eynî çavkaniyan hêzên dewletê di şer de, azneyên hov li dijî gel û gerîlayan bi kar tînin, bombeyan di ser kesên sîvil de dibarînine.

Ji bo piştgirîya Zapatîstan li paytexta Meksîkayê, li Meksîco Cîty'yê xwepêşandaneke li dar ket. Roja 13'ê Rêbendanê 100 hezar kes beşdarî vê xwepêşandaneke bû. Serokê Meksîkayê Salinas, şerrawestîna yekalî îlan kir.



Serokê Meksîkayê Carlos Salinas de Gotarî




Rewşa vê herêmê gelek dijîbe ya Kurdistanê, jî aliyê xizaniyê û pest û pêkûtiya dagirkeran-û mijokdaran-ê.

## 80 hezar kes jî bo Rosa Luxemburg û Karl Liebknecht meşîyan



Rosa Luksemburg



Karl Liebknecht

**Nûçeyên Derve-** Li Berlînê 80 hezar kes jî bo bîranîna salvegera 75'an ya Roza Luxemburg û Karl Liebknecht, ku sala 1919'an de li Almaniyayê hatibûn kuştin, meşîyan. Pankartên ku meşvanên dabûne destê xwe, di wan de ev dirûşme hatibûn nivîsandin. "Luxemburg, Liebknecht û Lenîn nayêne jîbîrkirin. Rabinê ser piyên xwe û li ber xwe bidin." Bi navê Gunther Kurt

meşvanek der barê meşê de wiha got: "Hejmara meşvanên vê meşê jî sala derbasbûyî du car pîrtir in. Qelsiya aboriya Almaniyayê û dijîminiya ku li Almaniyayê li hemberê biyaniyan tê kirin, dibe sedem pîrbûna beşdarvanên vê meşê, bawerîya sosyalîzmê hêdi hêdi di nav gelê Almaniyayê de cih digire. Meşên pêserojê dê pîrr xurtir derbas bibin."

Li ser rawestina tezkereya leşkeran, reva ji leşkeriyê li hemû Tirkîye û Kurdistanê zêde bû

# Firarên leşkeriyê bêqedar in

■ Têkoşîna ku PKK li dijî dewleta Tirk dide, bi artêşa Tirk biryarên girîng dide standin. Leşker, timên taybetî û cerdevanên li Kurdistanê li dijî PKK'ê qels dimînin.

■ Dewlet wek çare dixwaze pêvajoya leşkeriyê ji 15 mehan dîsa hilkişîne 18 mehan. Bi vî mebestê, artêşa Tirk gava yekemîn avêt û tezkereya leşkerên tertîba 72/4'an ji bo sê mehan da rawestandî.

■ Li hember vî biryarê li hin wargihên leşkeriyê, protestoyên ji aliyê leşkerên Kurd û Tirkên çepgir ve hatin li darxistin. Malbatên leşkeran û Komeleya Mafên Mirovan jî daxuyaniyên protestokirinê weşandin.

**Navenda Nûçeyan-** Heftaya çûyî bi rawestina tezkereya leşkerên ji dewleta 1972/4 bi sedan leşker ji artêşa Tirk firar kirin. Ji xeynî firaran, bi dehan leşker jî teşebûsî xwekustîne kirin. Heta niha, li gor agahiyên nefermî, nêzîkî sed leşkerên ji tertîba 72/4'an ji wargihên xwe reviyane. Li ser van qewimînên girîng, rayedarên artêşa Tirk tu daxuyaniyên fermî nekirine.

Heftaya çûyî, bi nêzîkbûna tezkereya leşkerên tertîba 72/4'an ku li dora 30 rojan ji roja terhîsa wan re mabû, ji nîşka ve ji aliyê rayedarên artêşa Tirk ve ji bo sê mehan pêşniyara biryara rawestandina terhîsa tertîba 72/4'an ji Meclîsa Mezin a neteweyî ya Tirkîyeyê hate kir. Pêşniyara Serokatîya Artêşê eynî roj jî hêla Meclîsê ve wek biryaremeke di hukmê qa-

nûnê de hate pejirandin. Ev biryara ku ji nîşka ve hate standin, wek bombeyekê li nav leşkerên ku li hêviya terhîsê bûn, teqîya û reaksiyonên bi hêrs ji aliyê leşker û malbatên wan ve xwe dan der. Komeleyên demokratîk û Komela Mafên Mirovan jî li hember vî biryara leşkerî daxuyaniyên protestoyê dane çapemeniyê.

Ev biryar ne tenê hizûra leşkerên li benda terhîsê birin, lê yê din jî şoke kirin, ji ber ku ew wek dirêjkirina pêvajoya leşkeriyê hate nixandî. Li van reaksiyonên giştî, Wezîrê Karê Parêzîyê, Mehmet Gölhan bi axaftinekê da diyarkirin ku ev biryar ne ji bo dirêjkirina demajoya leşkeriyê, bes tenê, ji ber rewşeke awarte mebesta rawestina terhîsa tertîbên 72/4'an hatiye standin. Tevî vî yekê biryar jî hêla gelek

kesên din ve jî wek ceribandina dirêjkirina leşkeriyê hate nixandî.

Wek tê zanîn sala çûyî, pêvajoya leşkeriyê ku 18 meh bû, sê meh hatibû kêmkirin û leşkerî bûbû 15 meh. Bes, ew biryar hîna hingê wek helwesteke siyasî hatibû nixandî, ji ber ku di dema propogandayê hîlbijartinê de partiya Riya Rast soz dabû ku leşkeriyê daxîne 12 mehan. Bes, ew biryar hîna jî destpêkê ve ji hêla derdorên leşkerî ve baş nehatibû ditin û amadekariyên ji nû ve dirêjkirina leşkeriyê dest pê

kiribûn.

Rayedarên dewleta Tirk di daxuyaniyên xwe de wek sebebê vî biryarê têkiliyên nexweş yê bi cîranan re, bi teybetî jî tehdîdên Yewnanistanê nîşan dan. Bes, ew daxuyaniyên wek weşartina zehmetiyên artêşa Tirk yê li Kurdistanê hate nixandî; şerê ku li Kurdistanê ji aliyê PKK'ê ve li dijî artêş û hemû saziyên Tirkîyeyê tê kirin. Dewlet jî bo ku karibe bersiv bide livbaziyên gerîla ji aliyekî ve hêzên taybetî perwerde dike û dişîne Kurdistanê, ji aliyekî ve jî dibîne ku ew jî tîrî na-



Mehmet Gölhan

kin, dîsa dixwaze bi awayekî pêvajoya leşkeriyê hilkişîne 18 mehan.



Orgeneral Doğan Güreş, ji bo ku firarên leşkeriyê zêde nebin moralê dide leşkeran.

## Endama Rêveberiya Tûm-Sağlık-Sen'ê winda ye

Endama Rêveberiya Tûm-Sağlık-Sen şaxa aliyê Anadoluyê Nazîfe Kaya ev 5 roj in winda ye. Nazîfe Kaya di Nexweşxaneyê Sûreyaya Paşayê de kar dikir. Malbata wê û hemû xebatkarên Tûm-Sağlık-Senê der barê Nazîfe Kaya de ji Şubeya Terorê tu agahî hilneda.

## Li Cizîrê provokasyona dewletê

Hêzên dewletê piştî Şimex û Hezexê, dixwazin li Cizîrê jî provaksiyonan binin pê. Leşkeran navçe dane ber gulebaranê, di bûyerê de mermiyên hewanê malek hilweşandin û jê 2 zarok 6 kes mirin. Ji malbateke din jî 5 kes birindar bûn. Ev êriş jî aliyê leşkerên Tabûra Tanqê ya Cizîrê ve çêbû. Li gorî agahiyên herêmi hêzên dewletê li nav taxên Cizîrê mermiyên neteqiyayî direşînin û li wir diteqînin.

## Greva birçîbûnê ya girtiyên Çepa Şoreşger bi ser ket

Girtiyên Çepa Şoreşger di girtîgehên Bayrampaşa, Çankiri, Yozgat, Malatya, Erzurum, Sakarya, Bartın, Kocaeli, Amasya, İskenderün, Antep, Ceyhan, Nevşehir, Çanakkale de jî bo îşkence û konevaniyên neheq yê ku di girtîgehê de didomin, dest bi greva birçîbûnê kiribûn. Xwestinên girtiyên di roja 33'yan ya grevê de ji aliyê kargerîya girtîgehê ve hate pejirandin. Girtîgehên Ankara, Aydın, Buca, Kayseri û Bursayê derveyî vî biryarê man. Di girtîgeha Mêrdînê de jî îşkence bi her awayî ve li ser girtiyên didomin. Ji bo hemû girtiyên Fesih Coşkun Kargerîya Girtîgehê protesto kir.

## Ji Aydinlikê Xelatên Cemal Sureya

Bi amadekariya rojnameya Aydinlikê, Xelatên Cemal Sureya hatine belavkirin. Ji bo xelatên Cemal Sureya di mûzeyê çapemeniyê de bi merasîmek çêbû. Di merasîmê de Berpirsiyarê Giştî yê Aydinlikê Ferît İlsever, li ser helbestvaniya Cemal Sureya sekîni û ji têkoşîna wî ya şoreşgerî mînak dan. Piştî axaftinê xelat hatin belavkirin. Yildirim Türker bi pirtûka xwe ya bi navê "Cihangîr Kedîlerî" (Pisîkên Cihangîrê), Alî Asker Barût jî bi pirtûka xwe ya bi navê "Üsküdar Şiirleri" (Helbestên Uskudar'ê) xelata Cemal Sureya hildan. Di merasîmê de gelek hunermendên bi nav û deng amade bûn.

DEPa bajarê Stenbolê kongreya xwe ya yekemîn çêkir

# 'Edî baweriya me bi demokrasiya wan nayê'

## Salîh Günbat

Kongreya DEP'ê ya bajarê Stenbolê roja 10.1.1994'an li Gazînoya Çakîlê hate çêkirin. Piştî hîlbijartinê, ji nû ve serokê berê Dr. Kemal Parlak hate hîlbijartin.

Kongreya DEP'ê ya bajarê Stenbolê roja 10.1.1994'an li Salona Çakîlê saet li dora 12'yan bi beşdarbûna gelek mêvan, endam, delegeyan dest pê kir. Di nava mêvanan de Serokê Rûmetî yê DEP'ê Yaşar Kaya, Parlamenterê Amedê Sedat Yurttaş, Parlamenterê Şimexê Selîm Sadak, xwişka Mehmet Sincar Bedriye û ji partiyên cur be cur gelek politikvan.

Kongreyê bi axaftina Av. Hasîp Kaplan (Endamê Heyeta Kargerî ya Bajêr) dest pê kir û li ser rewşa Kurdistanê ku niha tê de ye, bi dirêjahî sekinî û got: "Em biratiyê dixwazin, lê em biratiya Tırkeş naxwazin, em biratiya Güreş naxwazin, em biratiya Çiller naxwazin ji ber ku xwîn ji devê wan dirije, em biratiya Mamoste Beşikçi, Mamoste Başkaya û em biratiya gelê Tirk dixwazin."

Latîf Epözdemîr (Endamê Heyeta Kargerî ya Bajêr) ji di axaftina xwe de bi kurtahî wiha got: "Ger dewleta dagirker bi rastî aştiyê, şerwestandinê bixwaze bila bê vê salonê, kî dibe bila bibe ji yekî bipirse kesên ku li vê salonê ne em bi wan bawer in ku wê rîya aştiyê nîşanî wan bide, ev em ev in, partiya me ev e."

Epözdemîr, ji bo hîlbijartina belediyeya bajarê Stenbolê jî: "Yên ku li navçeya Ümraniyeyê di bin qerş û qal de mabûn nehatine ji bir kirin. Partiyên burjûva ku herin rayên wê navçeyê bixwazin wê di nava wî çiyayên qerş û kal de gel wan bixeniqînin." got

Şemsetîn jî got: "Ev demokrasiyeye çawa ye ku ji ber ku ez dipeyivim tême girtin, ev çî demokrasiye ku ji ber ku em dinivîsîn dîkevîne girtîgehan. Ez dibêjim ew ne demokrat in, ew dembokrat in. Ne demokrasi heye, demokrasiya wan jî dembokrasi ye. Lê ez dibêjim edî ew bibêjin demokrasi, demokrasi heye ji em nema ji wan bawer dikin. Ji ber ku gotin demokrasi em xapandin, gotin em demokrat in dîsa em bi wan xapiyan, nema edî emê baweriya xwe bi wan binin."

Sedat Yurttaş (Parlamenterê Amedê) jî li ser rewşa giştî ya Tirkiyeyê sekinî û wiha got: "Komara Tirk sala çuyî ji bo yî artêşê 100 trilyon ji butçeyê veqetandibû, sala îsal jî 400 trilyon veqetandîye. Ê ku mirov bide berçav hatina Tirkiyeyê 600 trilyon e, hengê mirov dikare bibêje ku şereki

qirêj heye, ji bo her tiştî 200 trilyon, tenê ji bo artêşê 400 trilyon tê veqetandin. Wê çawa gel mesût bibe. Wa ye leşkerî jî, ji nû ve dirêj kirin."

Alî Ekber Oğuz (Serokê DEP'a Kadiköy) wiha got: "Piştî pest û pêkutiyên dewletê em hê jî li ser piyan in. Em niha ji her demî zêdetir bi hêz in. Bi rastî gelê me pê derxist ku edî tiştêki ku partiyên burjûva bide wan nema ye. Ji bo serketinê divê zehftir li me xwedî derkeve."

Mürüvvet Cacim (Endama DEP'a Beyoğlu): "Komara Tirk ev çend salên dawiyê ku ketiye tengasiyeye mezin, ji bo şerê çekdarî dibêje emê biharê vê pirsgrêkê çareser bikin, nabe. Dibêjin zivistanê, ew jî nabe. Payîz û havîn emê hal bikin, kokê wan biqelînin. Lê heta niha bi ser neketine. Dewletê niha jî pê derxist ku nikare xwe li hember şervanê serê çiyê demeke dirêj bisekine ji ber ku gava dewletê şervanekî qetil dikir, bi dehan xortên Kurd derdiketin û li hember dewleta faşîst dibûn şervan."

Dewlet bêçare maye, niha jî bi ser gund, navçe û bajarên Kurdistanê ve diçe. Ev neçariya dewletê ye."

Wekî din Orhan Kaya (Serokê Kargerîya Xortên DEP'ê), Ahmet Cihan (Endamê Heyeta Kargerî ya bajêr), Doğan Genç (Ji DEP'a Ümraniyeyê), Hasan Erkul (Delegeyê Kongreyê), Ümüt Örtün (Endamê DEP'ê-Çerkes), Rıza Yağmur (Navçeya Avcılar), Hüseyin Yılmaz (Ji DEP'a Beyoğlu), Nurettin Yılmaz (Delegeyê Kongreyê) dirêj dirêj axivîn, hinekan rexneyên xwe li kargerîya DEP'ê kir. Hinekan jî kar û barên ku hatine kirin kêm dîtin û pêşniyarên xwe pêşkêş kirin.

Ji bo bersiva axiftan Serokê DEP'a Stenbolê Dr. Kemal Parlak derket ser kursî.

Wekî din di kongreyê de gelek mesaj hatin xwendin tede ji bo kurultayê serketin di hate xwestin.

Pişt re, ji bo hîlbijartinê delegeyan reyên xwe avêtin sandoqan. Di dawiyê hîlbijartinê de yên ku hatin hîlbijartin ev in: Dr. M. Kemal Parlak (Serokê DEP'ê yê bajêr).

## Berendamê Heyeta Rêveberîya Bajêr

Esil: Tülay Geyik, Şemsetîn Kara, İmam Doğan, Zeynil Abidin Kızılyaprak, Nihat Bayrak, Orhan Kaya, İbrahim İnce, Adnan Özbîngöl, Remzî Doğaner, Ümüt Örtün, Nurhayat Akman İşyapar, Sema Savaşal, Cenan Karakaş, Ömer Aşkara.

Yedek jî: Rifat Güler, Ayşe Erol, Üzeyir Avcı.

Kongreyê bi axaftina Av. Hasîp Kaplan (Endamê Heyeta Kargerî ya Bajêr) dest pê kir û li ser rewşa Kurdistanê ku niha tê de ye bi dirêjahî sekinî û got: "Em biratiyê dixwazin, lê em biratiya Tırkeş naxwazin, em biratiya Güreş naxwazin, em biratiya Çiller naxwazin, ji ber ku xwîn ji devê wan dirije, em biratiya Mamoste Beşikçi, Mamoste Başkaya û em biratiya gelê Tirk dixwazin."



Dr. Kemal Parlak



Mürüvvet Cacim




Xwişka Mehmet Sincar (Bedriye) ji beşdaran eleqeyeye mezin dî.



Av. Hasîp Kaplan



Latîf Epözdemîr



Şemsetîn Kara



Alî Ekber Oğuz



Alî Yılmaz



Doğan Genç

## NAVÊ DELEGEYAN

V. Tülay Geyik, Şemsetîn Kara, Zeynel Abidin Kızılyaprak, İbrahim İnce, Orhan Kaya, Remzî Doğaner, Abdullah Yıldırım, Hasîp Kaplan, Ahmet Soner, Ömer Aşkara, Cemil Gedik, Ahmet Şahdemir, Bedrettin Bayram, Nurettin Kaplan, M. Emin Firat, Yusuf Çirîk, Gülşen Bilgili, Zekî Çelebi, O. Uğur Ölcay, Mehmet Mutlu, Tarkan Kurtulmaz, Reşit Binici, Veli Mükyyen, Erdoğan Baysal, Bertan Zülaloğlu, Şengül Doğan, Burhan Karakoç, Mustafa Özdemir, Aydın Çalik, Osman Aytar, Rifat Güler, Neşet

Kandemir, Alî Ekber Oğuz, Mehmet Akar, Şah İsmail Vargün, Semra Gürbüz, Hidir Doğan, Mahmut Can, İsmail Birtek, Hüseyin Yüce, Ekrem Kaya, Üzeyir Çetin, Fesih Firat, Abdullah Aslan, Ahmet Sur, M. Müftü Kiliç, Nurettin Yılmaz, İhsan Kiliç, Özcan Kiliç, A. Mecit Kapazan, Sirop Demirci, Hasan Sincar, Halil Salik, Abdürrezzak Ökdemir, Hüseyin İpekçü, Selahattin Sarikamiş, Asiye Kolçak, İsmetullah Çoban, Mehmet Oğuz, Güvercin Turan, Niyazi İletmiş, Ahmet Karaoğlu, Mehmet Gündoğu, Haydar Karaman, Hüseyin Karataş,

Ömer Karadağ, Rıza Yağmur, Bircan Öztürk, Mehmet Can, Fatma İnanç, Cuma Tanrikulu, Hakkî Dalga, Eyüp Gökçen, Zübeyir Atabay, Emin Tendi, M. Şerif Çümşen, Davut Timar, İsa Eskin, Mahmut Özgür, Alî İncesu, Cemal Çoşkun, Abdulhalit Duman, Bilal Arslan, Doğan Genç, Fethi Ahmet Gül, İbrahim Ünal, Cemile Gündoğan, Cudi Tabakoğlu, Serap Mutlu, Sirri Feroğlu, Adil Kurt, Mehmet Polat, M. Ali Kirdök, Selim Okçuoğlu, İbrahim Gürbüz, Şefik Beyaz, Ayşe Karadağ, Abadülrahman Delî, Koroğlu Karaaslan, Hasan Erkul.



Pêdivî maka keşîfîkirinê ye.


Frederich Engels

# Me digot pepe

Li Zindana Leşkerî ya Amedê, kesên zana û xwende ji bo ku yên nezan û nexwende hişyar bikin, semîner û xebatên hêvajoyê li dar dixin. Di nav beşdarê semînerê da Apê Evdilqadir jî heye.

Ders li ser civaka pêşîn a jiyana komî (komînal) ye. Gotin tê li ser rewşa axaftinê ya wê demê qirasê dibe. Dersdar dibêjin ku mirov di wê demê de weke zarokê hê nû bi xebardanê ketibe, bi raweyên fermânî û baneşanan peyivîne. Wek: Bike, her, a, lêxe, ax, ay....

Piştî mijara dersê diqede, ji



Apê Evdilqadir dipirsin ku carekê jî ew vebêje.

Apê Evdilqadir jî xwe ewle û bawer, radibe ser xwe û dest pê dike: - Lawê apê min, baş

tê bîra min. Dema ez zarok bûm bavê min diçû bajêr. Gava jî bajêr dizivirî ez diçûme pêşiyê. Min digot: "Pepe Pepe"

Silêmanê Kal

# Bi namûs tiştêkî wer tune ye!

Yekî gundî li ser "endamiya PKK'ê" dikeve hundir. Li hundirê zindanê tim xwe dipesîne û ji her kesî re; "Ev 12 sal e ku ez di nav PKK'ê de me" dibêje.

Bi wê yeka xwe jî namîne, mezinatîyan jî li ser girtiyên xîsim yên gundî dike, pişikê xwe bi rewşa xwe mezin dike.

Rojekê di xebata hêvojîyê (telîmê) de gotin te ser her sê herfên PKK'ê. Serokê xebata

hêvojîyê jî beşdaran ku bi giştî kesên nexwende û xişim in pirs dike, ka meneya wan çi ye. Tev tiliyên xwe bilind dikin. Ji nav wan ê ku tim dibêje, 12 sal e ku di nav partiye de ye, tê niqandin.

Jê re dibêje: "Heval ka ji me re bibêje, her sê herfên partiye yanê PKK tê çi maneyê?" Yê gundî: "Heval, PKK, yanê PKK ye." Hêvojkar: "Herê em jî wê dizanin. Lê sê herf hene.

Her yek jê herfa pêşîn a peyvekê ye. Ka bibêje P" herfa pêşîn a kîjan peyvê ye?"

Gundî: "Heval PKK, PKK ye û hew." Ji nav kesên ku tiliyên xwe rakirine, yekî hildibijêrin. Jê dipirsin.

Gundî: "PKK, yanê Partiya Karkerên Kurdistanê" dibêje.

Gundiye PKK'yî (!) 12 salî xwe ranagire û dibêje: "Hema bi namûs tiştêkî wer tune ye"

Silêmanê Kal

Jûjî...

Doğan Güzel

• LI KURDISTANÊ JI BORE LI BER HILBUJARTINAN BÊ GIRTIN HERTIŞT TÊ KIRIN!



Ji bo ku hilbijartin bi awayekî adil were kirin, ji destê dewleta me hat, nehata te xîsîr kirin!

A xwe kirin! Çi hê ku em rayên xwe bikinê (Nîne)!

## KÊ ÇI PEKAND?

Leşkerên ku firar dikin nexweşên ruhî ne.

Mehmet Gölhan

(Wezîrê Karê Parêziyê yê Tirkiyeyê)

# Kerê Kurdan û otomobîla Amerîkayê

## Pismam

Doktor Kemal Ehmed dîroknivîsekî Kurd e. Wî xizmetekî pîr mezin ji bo dîroka me ya neteweyî kiriye. Min bi xwe, rû bi rû li Dr. Kemal guhdarî kiriye wî digot: "Belgeyên ku min li ser dîroka gelê Kurd ber hev kirin, bæguman ku du sed sal temenê min hebe, dîsa ez nikarim gişkan biqedînim."

Dr. Kemal ewqas dîroknivîsekî welatparêz e ku, li hola Fakûlteya Wejeyê ya Erebi ya Zanîstgeha Baxdayê, demekê xwendekarekî Erebi gotibûye, "Cafer Eskerî û Tahsîn Eskerî" Erebi in." Dr. Kemal rabû ser xwe û wiha gotiye: "Em, bi mabesta ku rastiyeke dîrokî binin ziman, dibêjin ew herdu kes Kurd in, nexwe em tu caran şanaziye bi kesên çêş nakin û xuyaye ku ew kes çêş in."

Gotineke wî ku, çend salan berî wê ku ji me cîwanan re gotibû, ez qet jî bîr nakim: "Kurdeyîyê bikin, ew qonaxa ku digotin, Kurdeyîyê eyb û şerm e dawî lê hat, Ereban li navenda Bexdayê lewhayek danine, li ser nivîsîna "Çêşxaneya (xwaringeh) dikê Ereban". Neteweperestiya dijminê me gihîştîyê vê radeyê, lê belê dema em qala Helebçeyê dikin, em dibêjin neteweperest û Kurdayetîkirin şerm e."

Heke em bîr ser mijara rasteqîn, em dixwazin gotareke Dr. Kemal li ser helwesta du mirovên Kurd der qehê Amerîkayê ku, di rojnameya Hevkarî de hatibû belavkirin rawestin û ragihînin xwendavanên hêja yên rojnameya Welat.

Doktorê giramgir wiha dibêje: "Dema ku Nuri Seid Serokwezîr bû, di serdema paşayetiye de, li Bexdayê nûnerê Amerîkayê hebû. Nuri Seid xwe nêzî wî dikir ku, Amerîka otomobilekê diyarî wî bike. Kir nekîr Amerîkayê otomobilek neda wî. Sedema vî tiştî jî xuya ye, Amerîka diyariyan dide kesên ku wê bibin noker, lê Nuri Seid jî mêj we hewce nîn bû ku, wî bi diyariyan bikirrin."

Dr. Kemal bi dirêjî li ser vê helwesta Nuri Seid dinivîse û bi awayekî zanîstî şirovekirinên xwe pêşkêş dike.

Ew, vê helwestê û helwesta

Qazî Muhamed a giranbuha û hêja ya ku di serdema Komara Mehabad de li hemberî nûnerê Amerîkayê derbirîya, dike kefên mîzîne (tayê terazûyê) û dide ber hev.

"Piştî damezirîna Komara Mehabadê, dewleta Amerîkayê ya împeryalist nûnerê xwe kîriya Mehabadê, ev nûner diçe serdana Qazî, bi dût û dirêjî li hev rûdinin û der barê doza Kurdî û Komara Mehabad de, di tîrînen xwe jî hev din re eşkere dikin. Piştî wan hemû tiştan, nûnerê Amerîkayê jî Qazî re dibêji: "Hikûmeta Amerîkayê ji bo we diyariyek heye, ew jî otomobileke xweşik û nû ye." Qazî mirovekî dilterr û bedewxwaz e û Serokê Komarê, Pêşengê Kurdan e, di gel wan hemû tiştan, tenê otomobilek wî ya kevin û normal heye. Qazî gotina Nûner bi kenekî tije wate, wiha dibersivîne: "Bawer bike cenab, bi dîtina min kerê Kurdan jî otomobîla Amerîkayê çêtir e."

Lewre, Xurmeya ku nûner hîn niha dixwe dendikê wê di berîka Qazî de bû. Heke mirov bi awayekî vekirî bibêje, Qazî dizanibû armanca vê diyariyê çi ye.

Ev e noker Nuri Seid û ev jî Pêşeng Qazî Muhamed û nemir e."

Dr. Kemal di dawiya gotara xwe de wisa dibêje: "Rojekê bê, li nav dilê bajarê Mehabada Ezîz em dê peykerê şerefmendiyê bo Pêşengê Nemir û Cîwanmêr çêbikin. Di wê rojê de, wê pîr Faris bibin Kurd, wek ku niha hinek Kurd xwe wek Faris nîşan didin. Em xêrhatinî li kesên ku dildarên dostaniya gelê Kurd in, dikin, lê belê nefretê li wan kesên ku niha dibin Faris dikin. Bila bê zanîn ku ew kes careke din wek Kurd nayên pejirandin."

## Perawêz:

\* Cafer Eskerî, Tahsîn Eskerî, du Kurdên xwefiroş in, di serdema paşayetiye ya hikûmeta Iraqê de. Ew du kes jî gundê Esker in ku nêzî Çemçemalê ye û bûrayên Nuri Seid in.

\*\* Wek nijadperestên Ereban, yên Tirkan jî dibêjin "Tirkiye ya Tirkan e" Ev hevok her roj di rojnameyên wan de dubare û hezarbare dibe.

Werger ji Kurmanciya jêrin, Pismam û S. Berbang

Rayedar, rêveber û mebûsên DEP hilbijartinên 27'ê Adarê ji Welat re nixandin

# 'Qedera hilbijartinê li Kurdistanê ye'

## Zana Farqînî

Dema hilbijartinên 27'ê Adarê nêzik dibe, hemû partiyên ku wê bikevinê, di kefteleftê de ne. Herkes li dû peydekirina berendaman e. Bi taybetî ji partiyên pergale (sêstemê) li Kurdistanê ji bo bi destxistina berendaman di tengasiyê de ne, tevî ku hemû alikariya dewletê ya pirralî li pişt wan e. Li herêmê bi tenê DEP xwedî karîne ye. Ji bo wê, geşla nedîtina berendaman nîn e. Li ji bo ku dor lê bê tengkirin û piştvanên wan qels bikevin çî ji destê dewletê tê tevî cerd, pêkati, girtin û hwd. teksîr nake.

Bi gotineke din li herêmê dewlet ji DEP'ê fikare dike û naxwaze di hilbijartinê de bi ser bikeve. Dizane ku gel jî li dû wan diçe, lewma dike ku berê gel jî wan biguhere. Heftiya berê me bi awayekî bi ser re be jî, rewşa DEP û dewletê li Kurdistanê danî ber çavan. Di vê hejmarê de me hin pirs ji mebûs, rayedar û rêveberên DEP'ê li ser xebat, amadehî û alternatîfên di rojê wan de kirin. Li gorî rewşa wan pirs ji wan hatin pirsîn.

**'DIBE KU EM JI HILBIJARTINÊ VEKIŞIN'**  
**Cigirê Serokê Giştî yê DEP'ê Osman Özçelik**, daxuyand ku hilbijartineke demokratîk çênebe wê jê vekişin. Özçelik pirsên me yên der mafê hilbijartinê de bersivand.

Ji pirsê me ya, "Di rojê wan de çî alternatîf hene û hûn dê di kîjan şertan de beşdarî wê nebin" re, bersiv da ku, ta niha 10 endamên wan hatine kuştin, bi sedan jî hatine birîndarkirin, ên ku dixwazin li ser navê DEP'ê li herêmê bikevine hilbijartinê, gef li wan tê xwarin û Dadgeha Qanûnê Bîngehîn jî li wan doza radana partiyê vekirîye. Osman Özçelik wiha didomîne: "Em bi vê rewşê dikevin hilbijartinê. Hemû teşkilatên me amadehiyên xwe ji bo hilbijartinê dikin.

Ger dewlet nehêle hilbijêr raya xwe bine zimên, hilbijartineke demokratîk çênebe û em bigihîn wê biryarê dibe ku em xwe ji hilbijartinê vekişin."

Özçelik li ser nebeşdarbûna Partiya Demokrasiyê ji bo hilbijartinên 27 Adarê jî rawestîya û fikra xwe wiha diyar kir: "Bila bê zanîn ku hilbijartinê Partiya Demokrasiyê nekeve ew hilbijartinê meşrû ye. Daxwaza me ya mezîni ew e ku, em di rewşê demokratîk de bikevine hilbijartinê."

Di van rojên nêzik de di çape-meniye de tê nivîsin ku DEP li bajarên mezin ên Tirkiyeyê berendamên Tirk dide nişan. Cigirê Serokê Giştî pirsê me ya li ser vê rewşê jî bersivand. Özçelik jî vê mijarê re ev daxuyan

■ **Rayedarên DEP'ê di bersivên xwe de didine nişan heke ku hilbijartin hem li Tirkiyeyê û hem jî li Kurdistanê di hewayeke xweş de çêbibe, wê DEP ji raya %10 bistîne. Tevî ku gelek ji hilbijêrên DEP'ê li Stenbolê bêqeyd in hêvî dikin ku wê 5-6 belediyên bi dest bixînin. Lê vê yekê jî dadixuyînin ku hilbijartin li wan bêne herimandin û dor li wan bê tengkirin, alternatîfa vekişina ji hilbijartinê jî difikirin.**



Zübeyir Aydar

dan: "Partiya me dê bi politikayên xwe yên serbixwe û bi berendamên xwe bikeve hilbijartinê. Bi tu partiyên dewletê re hevalbendî ne di rojê me de ye. Û em tu berendamên serbixwe jî naporêzin."

Li ser pirsê "Ji bilî Kurdistanê û li Tirkiyeyê, li bajarên mezin ên Tirkiyê politikayêke we yê çihê heye?" jî wiha got: "Li Kurdistanê û Tirkiyeyê li bajarên mezin û biçûk em dê doza wekhevî, biratî û aştîyê bikin."

Belediyên Partiya Demokrasiyê dê demokrasiyê li herêmê bi çih bîne. Biryarên belediyên me dê yên gel bûn.

Dizî û fehşî dê ji me dûr bin. Bi pirranî em dê xebatên xwe bi gel re bidomînin."

**'İHTIMALA RAYSTANDINA %10 HEYE'**

**Serokê DEP'ê Stenbolê Dr. Kemal Parlak** pirsên me yên der barê hilbijêrên neqeydîkirî, rewşa DEP'a li Stenbolê û xebatên wan ji bo kifşkirina berendamên de, bersivand. Dr. Kemal Parlak li ser pirsê me ya, "Li Stenbolê qeyda gelek kesên ku wek hilbijêrên DEP'ê tên qebûlkirin, nîn e. Bi taybetî ji Kurdên ku van salên nêzik hatine. Aqûbeta ku hatibû serê HEP'ê jî, ji we re diyar e. Ji bo ku neyê serê we jî we çî tedbiran standîye?" daxuyand ku gelek kes hatine qeydîkirin û her çiqas hilbijêrên wan jî aliye pêkanîna wezîfeya xwe ya hemwelatîyê ve qels bin jî, kes û darên nijadperest û pêşverû jî di dema qeydîkirina hilbijêran de bi taybetî ew nenivisandine.

Parlak vê rewşê ya qeydnêbûnê bi sê xalan ve girê da.

**1-** Ji Herêma Enebolê ya Rojhilat û Rojhilatê Başûr koçberiyêke nufûsî heye. Ev yek bi hemdê xwe nabe. Ji ber pêkutîya dewletê û rewşa şer e. Lew-



Osman Özçelik

ma pêwîst nabînin ku li vir qeydiya xwe çêbikin.

**2-** Ev kesên ku koçber dibin tî wê bajarên Stenbolê, li herêma xwe jî hesta hemwelatîyê pêk nayînin. Sebebên vê yekê hene, lê encam ew e. Di demeke kin de guherîna vê rewşê ne mimkûn e.

**3-** Dibe ku qeydiya wan jî aliye kesên şoven ve nehatibe kirin. Ev jî heye bi pirranî xort ji ber ku qaçaxê leşkeriyê ne, naxwazin xwe qeyd bikin.

Kemal Parlak bi berdewarî diyar kir ku ji bo jî vê rewşê bifilitin, li Stenbolê bi awayekî sift û tund dest bi xebatê kirine û hilbijêrên xwe qeyd dikin.

Li ser pirsê ku, "DEP li Stenbolê wê karibe çend belediyên bistîne û hûn bi taybetî li ser berendamên Tirk difikirin?" re jî vê bersivê da: "Li gorî peşniyarên Navenda Giştî ya Partiyê amadehiyên me didomînin û ji bo bajar û navçeyan tesbîtîkirina berendamên, komîsyonên me xebatên xwe didomînin."


Li Stenbolê em bawer dikin ku emê li 5-6 deveran belediyên bi dest bixînin. Heke hilbijartin di rewşêke serbest de çêbibe ihtimala qezenckirina %10 ray li tevahiya sinorê Tirkiyeyê heye.

Ji bo me ya girîng ew e: Ne hewce ye ku berendamên Tirk bin. Kesên naskirî û hatibûn qebûlkirin ji aliye hilbijêrên me ve bes e."

Mebûsên DEP'ê yên Sêrtê Naîf Güneş û xwediyê rojnameya me Zübeyir Aydar pirsên me, "Bi ya we divê di hilbijartinan de helwesta DEP'ê çibe" bersivand.

**'ARMANC QELSXISTINA ME YE'**

**Mebûsê DEP'ê yê Sêrtê Naîf Güneş**, di bersiva xwe de balê dikişîne ser gef, pêkutî, cerd



Naîf Güneş

û êrişên dewletê yên li gel û partiyê û dide xuyan ku dixwazin rê li ber wan bê girtin, dor li wan bê tengkirin.

Naîf Güneş bersiva xwe wiha didomîne: "Armanca dewletê ew e ku me qels bixîne, rayên me hindik bike. Lewma xelkî dipelçiqîne. Bi vê jî dixwaze li hemberî ray giştî ya dinyayê hêza me û rayên me biçûk û hindik bide nişandan."

Güneş dadixuyîne ku di dema hilbijartinan de nikaribin herin cem hilbijêrên xwe, bi wan re axaftin û civînan nikaribin li dar bixin, xelk nikaribe bê temaşa wan, li wan guhdarî bike, ew çax hewce ye ku protestokirina hilbijartinê jî di rojê wan de hebe.

Parlementer Güneş bi vî rengî dawî li bersiva xwe tîne: "Mese-la ku em nikaribin herin herêma xwe, wek ku ez nikaribim herime Mîsircê û xelk jî nikaribe were li min guhdarî bike, divê wê çaxê mirov protestokirîne jî bifikire."

Lê ew heye em nikarin bi serê xwe qerarê bidin. Partî li hev rûdîne. Di nêzik de her yek ji me wê here herêma xwe. Piştî vegeerê li gorî rewşê emê jî, ji xwe re metodekê bibînin."

**'DIVÊ WEK SEROKÊ BELEDIYAN ÊN FILİSTİNÎ BIN'**

**Xwediyê rojnameya me û parlementerê DEP'ê yê Sêrtê Zübeyir Aydar** jî di bersiva xwe de ya li ser pîsa me diyar dike ku, li ser wan êriş hene û tê xwestin ku dor li wan teng bibe. Aydar wiha pê de diçe: "Her çiqas êriş li me tên kirin û TV û rojnameyên me jî nîn in, divê hevalên me xebatên xwe bikin. Lazim e mal bi mal, kolan bikolan ji bo hilbijartinê bixebitin."

Zübeyir Aydar li ser çawanîya berendamên ku wê bêne eciban-

din jî disekine û dide zanîn ku berendam hewce ye talûkeyan jî bidine berçavên xwe û wek serokê belediyên ên Filistinîyan bixebitin. Aydar didomîne: "Divê DEP mirovên ku karin rîskan bidine ber çavên xwe ji xwe re bibîne. Divê ne bi tenê karên îdarî, yên siyasî jî pêk bînin. Wek serokê belediyên ên Filistinî ji xelkê xwe re bixebitin."

Mebûs Aydar dêhnê dikişîne ser ihtimala ku wê hîle di hilbijartinê de çêbibin û dewlet bi fên û dek bi ser wan ve diçe. Dide diyar kirin ku dewlet nehêle îradeya gel xwe di sandoqan de bide der wê jê vekişin.

Mebûsê Sêrtê Zübeyir Aydar bi van gotinan bersiva xwe diqêdîne: "Heke hilbijêr bi serbestî herine ser sandoqê, emê jê derkevin. Lê dewlet bi xapan bi ser me ve tê. Berendamên dirêvîne, gundan vala dike, dişewitîne. Hilbijêrên me jî me dikin. Ku di hilbijartinê de çek bêne bikaranînin emê nekevin hibijatinê. Em jî vê yekê re nabîne alet."

**'QEDERA HILBIJARTINÊ LI KURDISTANÊ YE'**

**Zeynelabidin Kizilyaprak (Endamê Lijneya Rêveberiya Bajarê Stenbolê yê DEP'ê)** jî pirsê me ya, "Bi ya we hewce ye DEP di hilbijartinê de çî bike?" bersivand. Kizilyaprak daxuyand ku ew jî wek qerarê Navenda Partiyê difikire û mîna ku DEP beşdarî hilbijartinê dibe, divê xebat û amadehiyên xwe bikin. Lê vê yekê jî diyar kir ku wê qedera hilbijartinê li Kurdistanê kifş bibe.

Endamê Lijneya Bajarê Stenbolê Kizilyaprak daxuyaniyên xwe bi vî rengî domand: "Lê wê qedera hilbijartinan li Kurdistanê kifş bibe. Heke ji dêla hilbijartinê mirinê bidine ber gelê me, divê Meclîsa Partiyê beşdarbûna hilbijartinê ji nû ve li ber çav derbas bike. Ku hîle bikeve hilbijatinê, DEP nikare vî webalî hilgire. Heta demokrat û pêşverûyên Tirkiyeyê jî."

Zeynelabidin li kesên ku bi qelskirina DEP'ê û rêlibergirtina wê dixwazin qezencan bi dest bixînin jî, gazî kir û îşaret kir ku, "Li ser xwîna gelê me kirina siyaseta jî tu kesî re feyde nayne."

Kizilyaprak helwest û polîtîya DEP'ê yên der barê hilbijartinê de bi sê xalan ve girê da, wan wek rihê programa partiyê nixand û dawî li daxuyaniyên xwe anî:

**1-** Helwest û siyaseta me divê rê li ber çareserkirina meseleya Kurdistanê veke.

**2-** Helwest û polîtîkaya me divê di serî de ji bo feydeya çîna karker û hêzên kedkar be

**3-** Helwest û polîtîkaya me divê demokrasiya ku ev 70 sel e li Tirkiyeyê nayê jiyandin, derxe pêş.



Nirxandineke giştî li ser rewşa çapemeniyê li Tirkîyeyê,  
di 1993'an de ji Zeynep Alemdar nivîskarê Associated Press'ê

## 1993: Sala girtina nûçevanan

■ Semîh Îdîz (nivîskarê turkish daily newsê) li ser rewşa çapemeniyê li Tirkîyeyê wiha dibêje: **"Medya li Tirkeyeyê qet ji bo agahdar kirin û hişyarkirina gel, bi nûçe û şîroveyan zanyarî kar nake. Bes wek navgîneke pereanînê ji bo xwediyê rojnameyan, tê bi kar anîn."**

Di sala 1993'yan de Tirkîye ji bo rojnamevanan cihê herî bi xetere bû. 7 rojnamevan li herêma ku Kurd şerê cudaxwaziyê yê tund lê dikin, hatin kuştin. 41 rojnamevan jî wek ku, rewşa rêveberiya leşkerî bi bir bîne, hatin girtin.

Salê bi kuştina nivîskarê rojnameya Cumhuriyetê Uğur Mumcu, ji aliyê tundxwazên îslamî ve, dest pêkir.

Di meha Tirmehê de dişa êrîşkarên îslamî, li dijî rojnameyê ku, parçeyek ji pirtûka Salman Ruştî, Ayetên Şeytên wek rêzenivîs çap kirin, protestoyeke êrîşbaz pêk anîn û di vê bûyerê de 35 kes hatin kuştin. Nivîskarê rojnameyê, ji destê êrîşbazan bi xweşî filitî.

Sal, bi girtina du nûçegihanên TV'yê, ji aliyê dadgeha leşkerî ve, ji ber ku bi kesên ku çûyina leşkeriyê red dikin re, di programa xwe de hevpeyvîn çekirine, qediya. Alî Tefîk Berber û Erkan Yıldız, heke ji aliyê dadgehê ve bi hinceta ku **"gel ji leşkeriyê dilsar dikin"** sūcdar bûn dîtin, wê 2 salan cezayê hepsê bixwin.

Komeleyên çapemeniyê yê navneteweyî ev bûyer protesto kirin û derbiryan ku, tenegehîştine ka ji bo çî du mirovên sivil di dadgeha leşkerî de tîn darîzîn, di demeke ku rêveberiya leşkerî ne li ser kar e. Hinek pirsan li ser rengê demokrasîya Tirkîyeyê pêşkêş kirin û rexneyên tûj li hikûmetê girtin.

Li gorî Nivîskarê Rojnameya Hürriyetê **Oktay Ekşi**, li Tirkîyeyê nezikî 900 heb qanûnên ku rê li ber serbestiya derbirînê digirin, hene. Hikûmet ji ber helwesta xwe ya li dijî tevgera cudabûnxwaz a Kurdan li başûrê rojhilat, balê dikişîne ser xwe.

Nûçegihanên Kurdgir her tim tîn girtin û weşanên wan tîn berhev kirin, destdanina ser kovar û rojnameyan bi vî rengî çêdibin. Zora giran li rojnameya rojane **Özgür Gündem**ê ku temenê wê 18 meh e dibe. Heta niha der heqê vê rojnameyê de **170** doz hatine vekirin, **99** nûçegihan û **11** belavkarên wê hatine kuştin, **200** hejmarên wê jî hatine berhev kirin.

Ev bû 20 sal ku, tîraja giş rojnameyan bi hev re 3 milyon e. Di gel ku nifûsa Tirkîyeyê evqas zêde bûye, hejmara xwendevanan wek berê maye.

Semîh Îdîz (nivîskarê turkish daily newsê) li ser rewşa çapemeniyê li Tirkîyeyê wiha dibêje: **"Medya li Tirkeyeyê qet ji bo agahdar kirin û hişyarkirina gel, bi nûçe û şîroveyan zanyarî kar nake. Bes wek navgîneke pereanînê ji bo xwediyê rojnameyan, tê bi kar anîn."**

Rojnameyên mezin, Hürriyet, Milliyet û Sabah, ansiklopediyên didine xwendevanên xwe. Her yekî jî van sala xwe bi êrîşên bi ser yê din ve derbas kir. Car caran wan êrîşan rûpelê pêşî bi giştî dagirt, cih jî nûçeyan re nema.

Serokê berê yê Enstîtuya Çapemeniyê ya Navneteweyî Peter Galiner got ku, **"Çapemeniya Tirk ji ber nakokiyê di navbera wan de nikare peywira pişeyî bi rêk û pêk bîne cih."** Ev gotin bi kesî ecêp nehat. Rêveberê Hürriyetê E. Özkök wiha dibêje: **"Demek e dirêj e em difikirin, ka ji bo çî îmajê me wiha şikestî ye."** Dişa nivîskarê vê rojnameyê Oktay Ekşi wiha dinivîse di quncikê xwe de: **"Ev tişt pêk tê ji ber ku beryî liberçavgirtina normên rojnamegeriyê, em di nav karên a-borî û dijraberiya bazara azad de winda bûne."**

**Ji rojnameya Turkish daily news'ê**

## Karmend di bin jopan de meşyan

■ Li tevaya Tirkîyê bi sed hezaran karmend, ji bo **"mafên sendîka û peymanên lihev kirina grevê"** di 14'ê Rêbendanê de, rojekê dev ji kar berdan û meşyan. Meşa protestoya karmendan, ji aliyê karmendên (polis) din ve bi copa hate bersivandin.

**Navenda Nûçeyan-** Karmend, li tevahiya Tirkîyê ji bo rojekê, dev ji kar berdan. Bi sed hezaran karmend, ji bo mafên xwe yî sendîka û grevê, li gelek bajaran jî, meşên mezin pêk anîn. Polis, li Enqere, Bursa û Meletiyê mudaxele yî meşê kir, gelek karmend bi lîxistinê birîndar bûn, zêdeyî 150 karmend jî hatin binçavkirin.

Di meşê de gelek sloganên cur be cur hatin avêtin. Wek: **"Karker û karmend bi hev re, bi çin grevê, bijî tîkoşîna me a demokrasî, bijî biratiya gelan, ji şerê qirêj re bes e!, Aştî, nan û azadî, bijî tîkoşîna me ya sendîkal, ji Qanûnê Antî-Terorê re nexer û hwd."**

Ji bilî Enqere, Bursa û Meletiyê, li bajarên din livbazî bebûyer derbas bûn. Bi pêşkêşiya 25 sendîkayên ku di bin navê Platforma

Sendîkayên Xebatkarê Dewlatê (Kamû), de cih girtine, ev livbazî hatine saz kirin.



Karmend di meşê de

Livbaziyan karmendan, li Stenbol, İzmir, Aydın, Balıkesir, Uşak, Denizli, Muğla, Manisa, Niğde, Samsun, Soma, Adana, Entabê û gelek navçeyên din pêk hatin.

Livbaziyan karmendan, li gelek bajaran kar sekinand, tesîrek mezin li ser dezgehên dewletê (PTT, TCDD, nexweşxaneyan û hwd.) kir.

## NÊRÎNEK

Îbrahîm Xort

### Dagirkerî û hilbijartin

**H**ilbijartin, yek beş e ku rewşa welatan datîne ber çavan, bê welatekî di nava çî saziyê de ye. Em dikarin bibêjin ev beş, beşa yekemîn e.

Gava ku em îro li xebatên hilbijartinê li Tirkîyeyê û Kurdistanê dinêrin, seranserê bûye navend tîkoşîna herdu aliyên. Dewlet, bi hemû hezên xwe yî qirêjî, ji bo ku vî hilbijartinê bi alî xwe ve bikişîne, di nava xwêdan û xwînê de maye. Ji aliyekî kesên ku pêşvêrî li herêmên Kurdistanê hebin, ya wan binçav dike, yan jî, ji bo ku koç bike çî asax hebe tîne serê wan kesan, da ku ew kes, ji herêmên xwe birevin û kesên paşverû weke endamên PR'ê, MHP'ê û yê ku bi navika xwe, eşkere bi dewleta dagirker ve girêdayî ne, bêne hilbijartin, tîkoşîna gel ya îroyîn bi paş ve bixe.

Ev xebata dewletê! Bes ne li hemberî van kesê pêşverû tenê ye. Li hember hemû kesên welatparêz û yê ku hemû tîkiliyên xwe ve, ji dewleta dagirker qetandine jî. Ev rastî, xwe di van êrîşên dawiyê de hîn bêhtir xuya dike. Hemû herêmên ku di binê bandora gerîla de ne, ji alî dewletê ve tîn valakirin—koçkirina wan tî xwestin. Sedemê vê, eşkere ye ku di van herêman de kesên paşverû nikarin rayekê tenê bistînin. Lê divê vî rastiya valakirin û koçkirinê ne tenê ji bo hilbijartinê mirov şîrove bike. Ev, mirovan ber bi çewtiyêke pîrr mezin ve bibe. Sedema vê ya mezin, jixwe tîkoşîna rizgariya neteweyî ye. Û di vî tîkoşîni de qutkirina tîkiliyên gel û gerîla ne.

Dewlet di wê zanînê de ye ku ev hilbijartinê hanê wê bibe weke referandûmekê. Dewlet, ji bo ku hebûna xwe li Kurdistanê li ser bingeheke heqî bide rûniştandin, hem wê bi hêzên xwe û hem jî bi hemû fen û fûtên xwe ve hilbijartinê, tevlihev bike. Em giştî dizanin ku dewletên dagirker ji tevliheviyê hez dikin. Ji ber ku berjewendîya wan ya mezin di tevliheviyê de ye.

Dewletên dagirker jî, ne bi serê xwe ne. Polîtîkayên xwe, bi destbirakên xwe re çêdikin û qet bêhev tu polîtîkayan ne dimeşînin û ne jî dikarin bimeşînin. Li welatekî ku tîkoşîn lê hebe û tîkoşîn her roj gav bi gav bi pêş dikeve, hemû hêzên destqirêj wê tevliheviyê zêde bikin. Qet naxwazin zelalî çêbibe. Çima ku her zelalbûn, derketina kesên destqirêj a ser avê ye!

Ev rewş bi giranî, li welatên ku mayîna dagirkeran bêhevî dibe, rengê xwe yê tarî hîn bêhtir û eşkere bi ser gel cep dibe. Sedemê vê jî, ev kes nema hewcedariya ku xwe veşêrin dikin (jixwe, nema karin xwe veşêrin!).

Di rojên wilo de, gel û kesên pêşverû divê li gorî polîtîkayên dewleta dagirker, polîtîkayên xwe çêbikin. Ya herî girîng, divê li gorî polîtîkayên pêşengiya xwe gav bi gav bimeşin.

## A. Zekî Okçuoğlu ket girtîgehê

Ebûqat Ahmet Zekî Okçuoğlu, di 13'ê Rêbendanê de, ji ber cezayê ku lê hatibû birrin, teslîm bû.

Okçuoğlu, jî ber hevpeyvîna ku di kovara "Demokratê" de derketibû, ceza wergirtibû. Li gorî Qanûnê

"Tîkoşîna bi Terorê re" Dadgeha Ewlekariya Dewletê ya Stenbolê (İDGM) bi sūcê "cudaxwaziyê" 15 meh ceza dabûye.

Wek tî zanîn ku Okçuoğlu, li ser vî biryarê wiha gotibû: **"Bi vî biryarê ez xwe wek terorîst dibînim."**

A. Zekî Okçuoğlu, xwediyê weşanxaneya Doz'ê ye.

Li ser vî girtinê, ebûqata Okçuoğlu Eren Keskin ev şîrove kir: **"Welatê Kurdan çawa hatiye parçekirin, bi vî qanûnî (Qanûnê Tîkoşîna bi Terorê re) malbatên Kurdan û jiyana wan jî tî parçe kirin."**



Okçuoğlu bi ebûqata xwe Eren Keskin re

# Çîroka stranê

Dîrok (tarîx) neyê zanîn.  
 Çîrok li qeza Dêrsimê li Xozadê derbas dibe.  
 Li gundekî Xozadê em nizanin bo çi,  
 lawikek (xortek) tişteki xelatî dike.  
 Mirovek jî diçe navçeyê (Xozadê) û derdikeve qata  
 miteserrif li lêwik giliyan dike. Em navê Miteserrif  
 nizanin, lê paşnavê Miteserrif  
 Saxiroxlî (Sağiroğlu) ye.  
 Miteserrif ji lêwik re xeberê dişîne û dibêje,  
 "Bila bê, derkeve qatê min û îfadeya xwe bide".  
 Lawik ditirse ku here Xozatê. Çimkî, Miteserrif  
 Saxiroxlî mirovekî zalim bûye. Lawik mecbûr maye  
 û bi rê ketiye. Gava ku lawik bi rê dikeve, dayîka wî  
 bi dûrê wiha dibêje:  
 "Lawo, çawa ku tu gihîştî sûka Xozadê,  
 here cem Qereman Axa û bi hev re herin  
 cem Saxiroxlî. Lawik tirs dihere sûka Xozadê û li  
 Qereman Axa digere. Lê..  
 Qereman Axa li vê derê tune bûye.  
 Lawik kor poşman dihere cem Saxiroxlî.  
 Saxiroxlî lêwik digire û diavêje erdê û bi pehînen  
 xwe lê dixê. Lawik li dora xwe difekire lê ji Alî Keko  
 pê ve tu kes tunne bûye. Ji Alî Keko alîkarîyê  
 dixwaze, lê çi çare ye ku Ali Keko qet deng der-  
 naxe. Saxiroxlî bi qondêrên xwe yê binî nalçe wî  
 dikeve.

**Berhevkar: Nesîmî Aday**  
**Çavkanî: Halîl Aday**

## DAYE NARIM XOZADÊ


Go; "Dayê narim Xozadê  
 Hundirê min ditirse  
 Saxiroxlî zalim e"

Go; "Welle min dikeve  
 Dayê narim Xozadê."


Dayê narim Xozadê  
 Go; "Bi du bare ye...  
 Saxiroxlî zalim e"  
 Go; "Min dikeve  
 Dayê narim Xozadê."

Go; "Xozat bişewite  
 Bi dara Alûçe ye  
 Saxiroxlî pehn kirim  
 Bi qondira nalçe ye  
 Dayê narim Xozatê."

Go; "Saxiroxlî zalim bû  
 Derî di ser min de zerze kir  
 Qereman Axa tune bû  
 Alî Keko qet deng nekir  
 Dayê narim Xozatê."



# Li kuçeyên Stenbolê gedeyekî stûxwar



## Rojhat Azadî

Zarokekî biçûk, di destê wî de cotek şimik li kuçe û kolanên Stenbolê digeriya. Sandoqa xwe ya boyaxê danîbû cihekî, li cotek sol digeriya. Cotek sol, nanekî danê êvarê bû. Li piştê wî çakêtekî pînekirî, di lingê wî de lastikên çîrr û çevalî. Di we serma zivistanê de qehwe bi qehwe digeriya. Hevaline wî yên li Stenbolê li dibistanan, ew li kuçe û kolonan bû.

Hindik deqewitandin ji karxaneyên xwe, hindik henekên xwe bi zimanê wî dikirin, hindik bi pehîna û şirpan ew ji qehweyên xwe diavêtin derve. Çend caran ji hevaline xwe yên xerîb kutan xwaribû, xwedê dizane. Çi dikir hîni vê jiyane nedibû.

Kesî nizanibû ji ku derê ye, Ji bo çi hatine vî bajarî, sewî ye an na? Bav û diya wî gelo çi kar dikirin? Kesî bi van pirsan serê xwe nedîşand jî. Herkesî dizanibûn ku Kurd e. Dema diaxivî Kurdî û Tirkî li nav hev dixist. Di çavên wî de tirs hebû. Çend birînen ji şewatê hîna li ser rûyê wî wînda nebûn.

Her roj serê sibehê di berbangê de ji xew radibû. Li dû nimêja sibehê çend kevçî şorbe vedixwar, belkî ji venedixwar. Sandoqa xwe diavête piştê xwe û derdiket. Car caran li ber diwarekî berê xwe dida rojê û çend kêliyan wek stûneke spindarî lê mêze dikir. Di van çend kêliyan de leq pê nediket. Dawiyê axîneke kûr dikişand û dest diavêt firçeyê xwe ji bo solan paqij bike.

Belkî jî rojê tişteki girîng dianî bîra wî. Çavên wî tim li wî aliya bûn.

Li gundê wî berf dibariya bi ser xaniyên şewitî de. Bi ser koza agir de dibariya. Ne ava

berfê û ne ji koza agir dibû masî. Gava tavê dida serê, aveke reş ji bin berfê diherikî ber bi rûbarê ve. Avê teniya reş dida ber xwe, dibir. Lê qêrîna zarokên ku bi zindî hatibûn şewitandin? Lê şewata mirovên şewitî, birîndar û miriyên wan...? Ji kevîrên şewitî, ji xaniyên bêmirov û ji gundên bêgundî bipirsîn... Tenê ew karin bersiva we bidin. Ji salên şewitî yên zarokan jî bipirsîn. Ew hîna li benda xwediyê xwe ne, bi hêviyê be kêmasî bidine we. Ew dê ji we re qala wî zarokê şîrîna bikin, bi hestîrên çavan. Ji kuçeyên nava gund pirs bikin. Ji çiya pirs bikin. Tenê ew dikarin bi bersiva pirsê we re, çareserkerîna pirsê jî bibêjin.

Ji bûyîna dinyayê bi vir ve, dermanê nexweşînan civakî yên mirovahiyê tim li çiya hatine dîtin. Zivistanê jî, ji bilindahiya çiya bi tenê aşîr nayêne xwarê. Di her demê de, li/her welatî bayên azadiyê tim û tim ji çiya hatine. Nebêje zivistanê sar e, berf dibare. Ji bo bayên azadiyê demsal nînin in. Şev û roj hîna nehatine gerdûnê. Demsaleke wan heye, bihar li cem zivistanê. Rojek wan heye, roj li cem şoreş û tariyê ye. Ji wan pirs bikin. Ew dê bersiveke ku hûn dixwazin bidin we.

Berxik, karikên zarokê biçûk ji bîra wî nedîcûn. Pez û beşçeyê wan tim li ber çavên wî bûn. Firavîna li ser kaniyên sar jî her wisa. Hevalên wî listikên wan ên wek çit, veşartok, gog û hwd. qet ji bîra wî nedîcûn. Dixwest he ma vegere gund, lê tişteki ji destê wî nedihat. Bi tenê di xewnan de mabû ew jiyân. Di çavên wî de hêviyek dihat dîtin. Ew dê vegeriya, ew dê biketa nav bayê azadiyê. Bi vê bawerî bû. Di baweriya xwe da mafdar bû. Dilê wî li mala rojê, berê wî li roja sibehê bû.

## Xelatên KRH'ê hatin belavkirin

Komeleya Rojnamevanên Hemdem xelata xwe ya "Rojnamevanên Salê" da xwediyan. Komeleyê, xelata xwe belavî gelek rojnamevanan kir, nivîskar û rojnamevanekî Özgür Gündemê jî xelat stand. Komeleya Rojnamevanên Hemdem xelata rûmetiyê da rojnameya "Oslobodense" yê, ya ku li Saraybosnayê de diwêşe. Komeleyê xelata piştgiyê da nivîskarê Özgür Gündemê Fikret Başkaya. Xelata hevpeyvînê jî bû para rojnamevanê Özgür Gündemê Sezaî Sarioğlu. Rojnameya "Oslobodense" ev xelat ji bo hin taybetiyên xwe stand, her wekî ev rojname di nav şer de dertê û xebatkarê wê li hember nijadperestiyê têkoşîneke bi rûmet daye. Fikret Başkaya ev xelat ji bo pirtûka xwe ya bi navê "(İflasa Paradigmayê) Paradigmanin İflası" stand. Sezaî Sarioğlu jî, ji bo dû xebatên xwe yê bi navê "Bekaa'nin Siyasî Çocukları (Zarokên Bekaa yên siyasî)" û Yeşilın Anayurdunda Yoldaşlarına Uşağım Diyen Birî (Li Welatê Heşînahiyê Kesekî ku ji Rêhevalên Xwe re Dibêje "Gedê min") xelata hevpeyvînê stand. Komelele bilî van xelatan, xelat dane xebatkarên Kovara EP'ê û gelek rojnamevanên din.

## CEJNA ÇAPEMENİYÊ HAFÊ PİROZ KIRIN

Li Tirkîyê 10'ê Rêbendanê Cejna Çapemeniyê ye. Dewleta Tirk di vê rojê de tu havilek ji bo mafê çapemeniyê û rojnamevanan wergirtiye. Her Wekî êrîşên xwe birine ser wan û gelek rojnamevan xistine girtigehê. Êrîş biriyê ser rojnameya Özgür Gündemê û rojnamefiroşên wê û hin rojname û kovarên din. Dewlet gelek rojnamevanan "terorîst" hesibandine û gelek astengiyên derdixwe pêşiya çapemeniya pêşverû û welatparêz.

# Bi Beşikçi re piştgiyaya xwedî wate

## Mehmet Gemsîz

Beşa Folklorê ya Navenda Çandê ya Mezopotamyayê (NÇM) ji bo piştgiyaya bi Îsmail Beşikçi re nişangeke dîayê pêşkêş kir. Nişang roja 9 Rêbendanê li NÇM'ê yê li salona çalakiyan bi navê "Li Kurdistanê Jiyana Civakî" çêbû.

Koma Govendê ya Serhildan ku ji Beşa Folklorê ya NÇM'ê ye, ji bo pişt bidine Sosyologê navdar Îsmail Beşikçi ku niha girtî ye, bi govendên dora Amed, Ruha, Semsûr, Gimgim (Warto) û Bilîsê ve nişanga dîayê pêşkêş kir. Li salona çalakiyan a NÇM'ê gelek kes beşdarî vê çalakiyê bûn.

Nişanga dîayê ya ku ji aliyê Koma Serhildan ve hatibû amadekirin, ji weneşên destkirên gelê Kurd, ji hemû beş û çinên civakê jin, mêr, zarok, ji gerilayan û rewşa şerê qirêjî yê li Kurdistanê pêk dihat. Nişang bi muzîk û helbestên bi Tirkî ve hatibû dewlemendkirin.

Di serî de pêşî weneşên li ser jiyana civakî yên ku karên xwe dikirin, wek kesên li zevîya genim leqatê dikin, yên li

**Koma Govendê ya Serhildan ku ji Beşa Folklorê ya NÇM'ê ye, ji bo pişt bidine Sosyologê navdar Îsmail Beşikçi ku niha girtî ye, bi govendên dora Amed, Ruha, Semsûr, Gimgim (Warto) û Bilîsê ve nişanga dîayê pêşkêş kir.**

ber çem beravî ne, yên ku bi kar û barên xwe yî rojane ve mijûl in. Di pey de destkirên gelê Kurd û derdan û hacetên ku dixebitînin tevî meşk, kulav, xalîçe, cer, kerpiçên biri-

mayî û hwd. hatin nişandan. Piştî nişandana wê rewşê wek ku ji Mamostayê hêjarê bibêjin, "Xeman mexwe, em niha wiha ne jî" lewre di vê beşê de pêşî werankerî û ta-

lankerîya hêzên dewleta Tirk a li Kurdistanê û dû re hêviya ku ji binê berfê derketibû, li ber çavên temaşevanan bi awazeke ku zayîne dinûnirîne hate rave kirin.



## Nûbihar



Kovara mehane ya çandî, hunerî û wêjeyî Nûbihar hejmara 15 bi sernavê "Gereke Kurd jî bi mekteb û medrese bin" derket.

Nûbihar di vê hejmara xwe ya dawîn de li ser mijara "Rewşa medreseyan kevin ên Kurdî çawan bûn" û "Îro Kurd ji wan medreseyan çawan karin îstifade bikin." lêpirsînekê çekiriye. Ji van kesan pirs hatine kirin.

## Nûbihar derket

Feqe Huseyn Sağniç (Zimanzan) Zeynelabidin Zinar (Nivîskar) İkrametin Oğuz (Xwediya Rojnameya Azadî) Mehmet Uzun (Romannivîs) Firat Cewherî (Berpirsîyarê Nûdemê), Şeyho Duman, Atasoy Müftüoğlu, Mufid Yüksel, M. İhsan Arslan, Mustafa Goyanî

Di hejmara nû de nivîsên ku balê dikişînin hin jê ev in: "İhmalkirina Pîrsa Kurdî, Bin-

ketin e. Süleyman Çevik: "Fehenga Semantîk A Kurdî" Sabah Kara, hevpeyvîna Alî karadenîz bi Mufid Yüksel re li ser pirtûka wî ya bi navê "Kurdistanîda Değişim Süreci (Li Kurdistanê Pevajoya Guherîne). Ji Yunus Emre û Sezaî Karakoç şîrên wergerandî, tevî "Em silmana in" a Mela Mehmûde Yûsivî, û "Nameyên bîcewab" a Sabah Kara.

## Şanoya Dayîka Nîştîman

### Anîs


Di meha Adara 1945'an de berî ku bûyerên Komara Mehabadê biqewimin sanoyek ji aliyê xortên Kurdên hunermend ve, li bajarê Mehabadê hate nişandan ku bandoreke pîrr mezin û bêhempa li ser gel hişt. Şano ku li gorî zarava wek "Dayîk Nîştîman" hate navandin, bi zimanê Kurdî bû û peyameke netewekarî dida. Dayîk Nîştîman di xetereyê de û destên wê di zincîrê de ye. Gişt bînerên şanoyê di gel dengên girîn û şîne yên lawên Dayîk Nîştîman ku li pişt perdeyê dihate bihîstin, hêstir dibaradin û di dawiyê de, di rewşê ku hemû temaşevan bi çepikên xwe hestên xwe derdibiryan, Dayîk Nîştîman bi alîkariya lawên xwe rizgar dibû.

Cara pêşîn bû ku li Kurdistanê, bi operayê, hizrên netewekariyên tûj dihat hişyarkirin. Di tu sehneyên wê şanoyê de nehatibû jîbîrkirin ku Kurdistan herêmeke oli

ye, lê piştî bi çend mehan ku di ser nişandana wê şanoyê jî bo gelê Mehabadê bihurî, bûyereke balkêş qewimî.

Di meha July (Tîrmeh) 1945'an de ku şano li dorhêlên Şinoyê ku di bin destê leşkerên Rûs de bûn hat nişandan, efserekî Rûs ku berpîrsîyarê wê herêmê bû bi awayekî tundî rexne li operayê girt û gote ku naverok û peyam (mesaj) a wê bi temamî li dijî Îranê ye û wek pêdivî daxuyand ku ji niha pê ve rolên neyînî û şeytanî yê operayê bi timtêla efsereke Almanî bête rayekirin û di dawiyê de divê ku lawên Dayîk Nîştîman bi yarmetiya çend efsereyan Rûsî nîştîmanê xwe ji talûkeya rojreşiyê rizgar bikin. Bi vî awayî guherîneke gelemperî di deqê (metnê) şanoyê de hate pê.

Rola Dayîka Nîştîmanê, rehmetî Ebdullah Nehrî Şemzînî dileyîst ku rûyekî pîrr bedew li serê bû û di payîza sala 1981'an de wefat kir. Her wisa Sirûs Hebîbî û Se-



Hejar Mukriyani

yîd Ubeydulah Eyûbiyan jî du listikvanên ji lawên Dayîka Nîştîman bûn. Helbestên operayê yên Ebdurrehman Şerefkendi (Mamoste Hejar Mukriyani) bûn.

■ *Yek ji stûnên bingeha demokrasiyê li Rojava û li dinyayê azadiya çapemenî ye. Eger mirov haydar bibe, gelek caran mirov pêrgî nivîsarên rexnegîr di çapemeniya Rojava de dibe nivîsarên ku bi çavekî rexnegîr li siyaseta welatên xwe ya derve dinêrin û hêviya guherandina awira gelemperî ya gelên xwe dikin.*

**Ziwerê Haco**

Yek ji stûnên bingeha demokrasiyê li Rojava û li dinyayê azadiya çapemenî ye. Eger mirov haydar bibe, gelek caran mirov pêrgî nivîsarên rexnegîr di çapemeniya Rojava de dibe, nivîsarên ku bi çavekî rexnegîr li siyaseta welatên xwe ya derve dinêrin û hêviya guherandina awira gelemperî ya gelên xwe dikin.

Ji bo girîngiya têgihîştina siyaseta aborî ya welatên rojava li hemerî welatên cihana sêyemîn, min girîng dît hin noteyên ji nivîsarekê li ser rapora SIDA<sup>o</sup> ya bi navê "Riya xelasiyê ji dafika deyndariyê" û rapora "UNICEF" ya bi navê "Serxweve hatina Afrîqayê di salên 1990 de", ku min girtine, bidim diyarkirin.

"... Dev ji Afrîqayê berdin, bi navê zanyarên Afrîkayê Femî Alkomolafê, di hejmara dawî ya rojnameya "New Afrikan" de dinivîse. " Afrîkayê serxwebûn û serdestiya xwe li ser koneyaniya aboriya xwe winda kiriye. Bernamêyên me yên pêşvebirinê bi destên pisporên Fonda peran û Banka Cihanê tînin nivîsandin û pêkanîn. Ew ne bi tenê biryara li Afrîkayê, dê çî were çandin didin, lê dê çawa pere ji bînan bikanîn."

"... piştî dema kolonyalîzmê û sazûna dewletên serbixwe, tu tiştî weke krîza deyndariyê piştî welatên Afrîkayê belengaz xûz nekir. Ji 1982'yan ve welatek di pey yekî re, bêcare dikeve."

"... Pisporên Bankeya Cihanê û siyasatmedarên Rojava ji wan re weke çare û derman guherîna struktûrê û reformên aborî û siyaseta şidandina kemberê (yanî zêdekirina hawirdeyê (export) û kêmkirina salox didin. Car carina jî li gor dem û hoyan şîretên weke demokratîbûnê, kêmkirina mesrefa leşkerî li wan dikirin. Rast e, ev şîret û daxwaz baş bûn û di cih de bûn. Lê dîsa jî têrî xelasiya welatên wan jî têkçûn û tehlûkeyê nedikirin."

"Ev şîret û çare bêncam mane. Ev deh salên krîzê ne û her ku diçe rewş xerabtir dibe û tu pêşketin xuya nakê. Deyn zêde bûne. Xwestina deynan kiriye ku deyndar derve firoşiyê zêdetir bikin. Vê jî hiştiye ku hevrikiya li ser bazaran zêdetir bibe. Helbet ku hevriki jî zêde dibe, buhayê mal jî dikeve û kêmtir dibe. Li gor lêkolînan jî bo zêdekirina hawirdeyê û ji dafika deynan azad bûnê, buhayê dervefiroşiya malê weke çayê û qehweyê, nake %20 buhayê xwe yê berî krîza deyndariyê. Hatina dervefiroşiya 26 welatên Afrîkayê yê herî belengaz ya sala 1992'an nake 1/2 pîncyekê hatina dervefiroşiya wan ya sala 1980'yi. Ewqas xwe eşandin û helwest, hemû jî bo azadiya jî krîza deyndariyê."

"... Tehdîda krîza deyndariyê li ser welatên cihana sêyemîn ne nû ye. Tiştê herî nû, li gor lêko-

lînên Enstîtuya Navneteweyî ya Amsterdamê, ku ev krîz êdî dewlemendiya welatên endustrî jî tehdît dike. Dokumentên lêkolînê didin xuyakirin ku krîza deyndariyê rê, ji guherandin û xerakirina xwezayê re, ji bazirganiya esrarê re, ji zehmetiyên aborî re, ji zêdebûna penaberan li welatên endustrî re û ji astengiyên leşkerî û siyasî re vekirî ye. Yanî bi hin gotinên din, ev krîz careke din bandora xwe li ser welatên pişketti çêdike."

"... Heya niha dezgeha ku bi giranî li ser vê rewşê sekiniye û pêşniyar û çare afirandine, organa Neteweyên Yekbûyî (NY) ya UNICEF' yê.

"... Di rapora xwe de ya bi navê "serxweve hatina Afrîkayê di salên 1990'an de" eşkere dike, ku Afrîka di salên navbera 1960-70'yi ber bi pêşveçûneke berbiçav ve diçû. Lê ber guherandinê, bi krîza deyndariyê re dest pê kir. Bi kurtî vê yekê kir ku salên 1980'yi bibin salên wînda. Ji ber ku mirov:

1. Li Afrîqayê ferz kir dê çî were çandin û deranîn.
2. Siyaseta bazirganiya serbest ferz kir. Vê jî rê li ber pêşveçûna pişeya welatîni girt û hêrivand.
3. Berê hêza kar ji sektorên alikariya civakî û mirovî guhert û da sektorên karên ji bo sivikkirina deynan.

Di ser van hemû kirinan de jî hin siyaseta reformên aborî nikariye xwe ji aloziyên binketina bujetê û enflasyonê yên ku hin di sewiya berî deh salan de ne, xwe xelas bike."

"... Li gorî UNICEF'ê çareyên rast ew in ku mirov berê plan û bernamêyên pêşvebirinê bide fîrêhkirina çandiniyên ku hatine rakirin, peydakirina endustriyê ku jê re hêza kar tê xwestin, bihêzkirina sektorên civakî ji bo belavkirineke rewşa û baştir û peydakirina hoyên zêdetirbûna dahata neteweyî."

"... Hin rêxistinên ku alikariya mirovan dikin û pêşvebirina welatên li paşmayî dixwazin weke rêxistina SIDA' ya Swêdî pêşniyar û daxwaziya rakirin û hilanîna pîrraniya deynên welatên belengaz dikin."

"... Krîza deyndariyê ne hêzêke xwezayî ye. Du sebebên wê hene:

- a- Dawedariya xwediyê deynan li deyndaran ku ji aliyekî ve deynên xwe bidin.
- b- Ji aliyekî din ve serdestiya wan li ser plankirina civata deyndaran."

"... Eger mirov bala xwe bide herikandin û guhestina sermaye di navbera welatên dewlemend û deyndar de, baş zelal e ku pere ji welatên deyndar û belengaz herikîne yên dewlemend.

Eger mirov hemû perên ku bi rengê alikariyê, deynên nû, sermaye razandin, bikaranîna sermiyanê taybetî û hemû danehev û kampanyayên alikariyê ku ji

# Cinayetên li dijî mirovahiyê



Nêçîra insanên li Gerdun

welatên endustrî çûne welatên paşvemaî hesab bike, koma wan dike 927 milyar dolar. Di eynî wext de welatên Cihana Sêyemîn bi tenê faîza deynan û parek ji deynan 1345 milyar dolar li wan vegeandine. Enstîtuya Amsterdamê vê yekê dide ber tevayiya kilfeta Plana Marshal ya ku bi qîmeta pereyên sala 1991 digihîje 70 milyar dolarî. Bibêje di kêmtir ji deh salan de welatên dewlemend bi qasî şeşqatî Plana Marshal ji welatên belengaz standine."

"... Tiştên ku bi navê krîza deyndariyê tên kirin, cinayetên dijî mirovahiyê ne. Bi milyonan însan dibin mehkûmên jiyanêke

jar û belengaz û bêhêz."


"... Gelên welatên endustrî jî ku awayê tevgera hikûmetên xwe nadin sekinandin, dibin şirikên van cinayetên, ew jî mirovahiya xwe didin bi halxweşiya xwe. Awira pêwîst di vê demê de gerek e wekî ya berî dused salî, ya dijî koletiyê be."

"... Ji aliyekî din ve jî şirikên cinayetê hikûmetên Cihana Sêyemîn in, yên ku li ser talankirina hemwelatîyên xwe, xwe zengin dikin. Çend ji wan jî hêla gel ve hatine hilbijartin? Gelo ew dest ji xweşî û dewlemendiya berdidin û jiyanêke rewşa li welatên xwe peyda dikin? Gelo kes ji wan dikare îdia bike ku nûneriya gel di-

ke? Ji tiliyên destan ne behtir in!"

"... Tu rê jî, ji demokrasiyê pe ve nîn in. Rejîmek tu caran nikare behtir ji daxwaziya gelê xwe baştir bibe. Lewma ji bo wekheviya miroviyê gerek hemû derfet (aborî, qanûnî, zanyarî) ji hemû bindestan re bînin dayin. Bi tenê gava gelên Cihana Sêyemîn di rîya nûnerên xwe yên rast re bixivin, dê hingî dengê wan were bihîstin û hurmet kirin. Dê hingî jî nû ve pergala dinyayê di navbera aliyên wekhev de bibe pîrsa danûstandinê û ne bi zora qamçiyên diktatoriya deynan ve were birêvebirin."

\* SIDA Rêxistina Swêdî ya pêşvebirina navneteweyî ye.



# Cizîra birîndar

Hatine sersaxiya te xwediyên te  
Xwediyên te ne Cûdî, Şirnex, Xelat  
Pišta te ne Herekol, Handrê û Ararat  
Xeyidîbû tav, vemirî roj tarî

Şîna te dikin ewrên tebeqa heştan  
Ser hildabû çemê Kezerê, ber bi  
ewran ve diherikî

Dixwaze tavê bitefîne  
Bila ronî nede dinyayê  
Tarî bibe دنیا tev  
Belkî bibînîn birînên te  
Di taristana şevtarî de  
Belkî bidin derman di lepan de  
Lê nade, nake dinyaya derewîn  
Nade, xapînokê  
Tu ne delal î  
Ez te naxwazim

Zirmîna zergan digihîşt asîman  
Min digot tu yî, ey Xweda!  
Madem ne tu yî, kî ne ev?  
Kî ne ev?  
Dibarînin wisa zergên îlahî  
Madem zerg ne yên te ne  
Dibe ku ji cebilxana te dizîbin  
Nevîçîrkekî te hate kuştin, tu sax bî

Xeyidîne Şirnex, Nisêbîn, Sîsê,  
îroj jî Cizîr  
Xeyidîne, kes neçûye sersaxiya wan  
Nava rojê avêtibû hîv  
Dileylisîn stêrk li asîman  
Vedimirîn, leylan didan ser Cizîrê  
Şan û nîşana sersaxiyê didan  
Koma Sêwiyên ne xuya bû  
Kadiz, rêya goristanê nîşan nedida  
Ewrên spî, gulmîn dida ewrên reş  
Ewrên reş, diengirî di nava xwe de  
Pirûskên tolegir amade bûn  
Berfa sor dibariya

Torvanan tor dikir çemê Kezerê  
Masî li bejayiyê dilan dikirin  
Pîra Fatê bû îske-îska wê  
Kalê Amo, ji kerba hêstirkên wî ne  
dixingirîn

Carîneke esebî ji cemedî Mereto  
Agir diçiran ta bigihîje Mîrê Eceyan  
Ji heybeta wî bayê legan bawirî  
Qara Tajdîn bû li hespê Kulik siwar  
Gaz rakiribû hespê li ser stêrka şîvê  
Zînê li ser mija Çiyayê Cûdî nifrîn dikir  
Beko bi legan re dikeniya  
Mîrê Botan sermest e  
Stîyê agir berda mala xwe  
Mem di zîndanê de tewebakarê evîne  
Kewên nêçîrê, li nêçîrê ne  
Îsal zêde berf dibare

Biharê kanî dê di kevîran de jî  
der bibin

Newroz ma çend roj  
Cînarê me Memo çûbû nêçîrê  
Betekî girt nêçîr kiribû  
Şêrxan jî panzdeh kewik kuştibûn  
Çend kevok jî, ketibûn dafika  
Zerdeşko

Stûyê tutika Xanimê di dafikê de  
asê bûye

Berete ji baska xwe birîndar e  
Dayîka Berfo agirê kuçikê geş kiribû  
Pêtî bejneki bi ser banê ve ketibû  
Li ber ewran diket biskên pêtiyê  
Çirîskên gurriyê bi ser Cizîrê ve wek  
sorgul dibariyan

Gulên Mihemedî çevnebariyan dikirin  
Distrên bilbil li ser pirpizêkê  
Xewin bû li ber çavên min  
Lê ez hişyar bûm jî.

S.S. Dilpolo

## AZADÎ

Abdurrahman Durre



### Şêr û keftar

Şêr ji keftaran qet hez nakin. Lê ji werşeqê (werşeq-weşeq kûviyêke ku postê wê pirr rind e) zehf hez dikin. Mirov dikare bibêje ku şêr aşiqê werşeqê ye. (Çawa ku Zeyneba Zer jî dibêje Clînton aşiqê wê bûye). Keftarê sextekar jî dixwaze ku weke werşeqê bikeve çavê şêr û nêzikî şêr bibe. Li hemû hîle û dolaban digere û difikire, bi tu awayî dilê şêr bi xwe ve girê nade û meyla wî bi aliyê xwe ve nadêre. Di dawiyê de ev hîle tê hişê wî ku postê werşeqê li xwe bike, xwe bixe şûna wê û şêr bixapîne. Heta ku keysê lê bîne, şêr bikuje û li textê wî rûne, bibe qralê daristanê (dehlê). Keftarê genî postê werşeqê bi dest dixê û li xwe dike, dertê hizûra şêr lê pirr nêzikî wî nabe. Bi tirs li balê rûdinê. Şêr dibêje, "Werşeqê, çima tu wilo dîr rûdinî, kêfa te jî pirr ne xweş e. Kerem bike were nêzikî min rûne. Tu dizanî ez ji te pirr hez dikim." Keftarê minafiq dibêje, "Qralê min, ez hem westiyame, hem jî min sîr xwarine, bêhneke pirr ne xweş ji min tê, ez naxwazim te aciz bi-

kim." Şêr dike, debêje, "Na na, ez ji te aciz nabim, lê ez ji boçika te fêhm nakim. Gelo ez şaş im an boçika te heye? "Şêr ku wilo dibêje, keftarê sextekar li boçika xwe mêze dike, dibîne ku boçika xwe rind veneşartiyê, boçika wî ya pîs di binê postê werşeqê re derketiyê derve. Fêhm dike ku şêr bi hîleyên wî hesiyayê, pîs pîs radibe û diqêşe. Şêr bang

**Keftarê pîr, Erbakan Xoceyê sextekar jî di van rojan de, ji aliyekî ve weke Zeyneba Zer, Ecevit (Kurê pîr), Xêsîzadê Îspartelîzede û gur û rovî û keftar û cenewarên din, difikire û dimeşe, ji aliyekî din ve jî dixwaze di bin postê din û îmanê de nijadperestî û tûranîzma Osmaniyên barbar û faşîst dîsa bixe bela serê cîhanê û Kurdistanê. Her wekî Yawuz û Evdilhêmidê wan î sextekar û barbar, bi hîle û pîlan, virr û derewan, bi navê din û îmanê Kurdan bixapîne.**

dike, dibêje: "Sextekarê genî, ezê pišta te bişkênim. Qeşmerê teres, divê ku ez careke din te li hizûra xwe nebînim.. Bicehime here, hêj ku min tu neperçiqandiyê..."

Keftarê pîr, Erbakan Xoceyê sextekar jî di van rojan de, ji aliyekî ve weke Zeyneba Zer, Ecevit (Kurê pîr), Xêsîzadê Îspartelîzede û gur û rovî û keftar û cenewarên din, difikire û dimeşe, ji aliyekî din ve jî dixwaze di bin postê din û îmanê de nijadperestî û tûranîzma Osmaniyên barbar û faşîst dîsa bixe bela serê cîhanê û Kurdistanê. Her wekî Yawuz û Evdilhêmidê wan î sextekar û barbar, bi hîle û pîlan, virr û derewan, bi navê din û îmanê Kurdan bixapîne. Ji şoreş û mucadeleyê û serhildana wan a pêşketî, xurt û dînamîk ji pare bide û zeyîf bike û dewleta kemalîst a KT'ê jî ji bêçaretîyê derîne. Li ser hîmê înkâr û asimilasyonê dîwarê selteneza xwe ya faşîst û nijadperest deyne. Bi milî mefkûreyê xwe ya xwînmij û genî boyax bike, rake ser lingan û di dawiyê de, bi bira û hevalên xwe yên wekî Turkeş, Ecevit, Yilmaz û bi xwişka xwe ya dîlegura Asena re bibe yek, narê û awazên tûranî lê de, bi bang û zang û zil û zengilên yobazî û canbazî, bi durûtiyên reng reng ve ji nû ve bikeve govenda pezkogiro (lîstika gur û pez) ya Kurd û Kurdistanê, ji binî ve rake û dawî lê bîne. Bi rastî jî, keftarê genî Erbakan Xoceyê partiya wî ya qeşmer, di van demên nêzik de, bi taybetî vê lîstika qeşmer dilîze. Lê şêrên şoreşê bi vê lîstika xain hesiyane û rind fêhm kirine û jê re dibêjin: 'Keftarê genî. Em te nas dikin, me dêla te di binê postê werşeqê de dîtiye.'

Nameyek ji keçên Kurd ên evîndarên serxwebûn re

# We hilbijart evîna xwe

Hevala delal, ger kêmasiyên min hebin li min biborîne îroj ku ji min dûr, lê mixabin ez ji te û dayîka nîştiman gelek dûr, li welatê biyanî, li metropolên Tirkiyê dijîm û nokeriya wan dikim; bona ku hinek dirav (pere) bidin min, ji bo pêdiviya mala xwe pê kîloyek, du kîlo bacan û hwd bistînim. Lê bawer bike hevala min ez ji vê jîne gelek sitembar im, di nava vê diwariyê de ez ranawestim û bi her awayî xebatê ji xwe re diafirînim. Hevala min: Lehenga serê çiyar bawer bike, tiştê ku di hundirê xwe de ez ger bixwazim ji tu caran ez nikarim derxim û birijînim seranserî rûpelên spî. Lê belê ez karim ji van parekê bînim ziman. Êvarek ji êvarên biharê bû her der şînahî, rûçikê Kurdistanê ji gul û sosina xemilîbû, Xeberek belav bû, min bihîst ku hevala min û du heb heval beşdarî tevgera rizgariya Kurdistanê bûne. Gelekî kêfxweş bûm, rojan serî kişand û şev li peyê diçû. Bêrawest, î tim û tim

dimeşyan bi vî awah.î Sê meh derbas bûn, ez ji ber xizaniye û nebaşbûna aboriyê hatim metropola Bûrsayê çend roj derbas bûbûn an nebûbûn min xeberek reş bihîst, dilê min bi lez lêxist. Tiştê ji hundirê dilê min qetiya û çû. Ji wan pakrewanan yek jê hevala min bû. Belê heval gelek mixabin min şerê te û hevalê te yî gelek ciwan bi çavên xwe nedît, lê belê gelek bawer im we bi bawerî û dilekî şad û fedakarî rahiştibû vî barî. Armanca we berxwedan bû. We bi baweriya xwe hêza xwe rahiştin barê dozê û ber bi pakrewanên Kurdistanê pêngav pêngav meşyan. Hûn zû gihîştin armanca xwe, we ji xwe re evîndarê xwe bi destê xwe hilbijartibû û bi hev û din re bi dergistî bûbûn. Hûn bi hesreta hev û din heliyan mîna Mem û Zînê li gundê Çinarê we destê xwe dan hev û hûn bi coşeke mezin û bi dilaneke geş gihîştin hev û serfiraz bûn.

**Kedkar Çin**



## XAÇEPIRS

Amadekar: Rasto Zilanî

**Çeperast:** 1-Nivîskarekî ku di wêne de tê dîtin. Bi eslê xwe Kurd e de ku bi zimanê Tirkî dinivîse. Zehfên çirok û romanên wî li ser koçberên ku ji Kurdistanê hatine rojava û hemwelatîyên Tirkiyeyê yên li Almanya dijîn, hatine nivîsandin. Navên çend pirtûkên wî: Siwarek di dinyayê de derbas bû, Dergûşa hesin, Kesên bêxwedî, Reşo Axa, Strana spî, Nanê Alman... 2-Bi zimanê Ewropîyan huner/ Cînavkeke yekehejmar a şexsê duyemîn/ Îşaret/ Yan 3-Pirtikeke neyîniyê/ Hêla ku li hember başûr dimîne/ Roja ku mirov tê de ye 4-Netîce/ Navê madeyêke kîmyewî 5-Navê enstrûmaneke muzîkê/ Sewal 6-Bi Tirkî leşker 7-Kesê ku peywira wî (wê) stranbêjî ye 8-Pirsek/ Dûa 9-Tiştê ne tûj/ Yan 10-Navê pirtûkeke Albert Kamus

**Serejêr:** 1-Bayê ku bi xwe re toz û dûmanê radike 2-Berevajiyê neyînî/ Rica 3-Kurtnivîsîna Komara Tirkiyeyê/ Sembola Kromê/ Dîn 4-Êdî zehf demsala payîzê beriya baranê xuya dike/ Sond 5-Qirêj/ Li hinek deveran ji ling re tê gotin 6-Navê hejmarekê/ Vala, beredayî 7-Berevajiyê "na" 8-Navigîneke muzîkê/ Bi Kurdî navekî jinan 9-Kurtnivîsa navê

	1	2	3	4	5	6	7	8	9	10	11	12
1												
2												
3												
4												
5												
6												
7												
8												
9												
10												

pereyên Almanayê/ Cînavkek 10-Pêxemberê Xirîstîyanan 11-Nalîna bi deng 12-Jêrenot  
**BERSIVA XAÇEPIRSA HEFTIYA ÇUYÎ**  
**Çeperast:** 1-Cengîz Altûn 2-Enî/ Sar/ Aram 3-Zelal/ Vîn/ Va 4-Ad/ Rênas 5-Yom/ Men/ Êne 6-İlon 7-Rabe 8-Kî/ Awir 9-Çê/ Arî 10-All/ Ok  
**Serejêr:** 1-Cezayîr/ Ça 2-Enedol/ Kêl 3-Nîl/ Morî 4-Âr/ Na/ AA 5-İslêm/ Bar 6-Za/ Netewî 7-Arvan 8-İs/ Gerok 9-Tan 10-Ûr/ Ên 11-Nav 12-Mal

## KARTA ABONETIYÊ

Ji kerema xwe re ji hejmara ..... pê ve min bikin aboneyê rojnameya Welat

Nav:

Paşnav:

Navnîşan:

**Bedelê abonetiye razînin:**

**Li derve:** Mazhar Günbat

İş Bankası Cağaloğlu Şub. Şube No: 1095

Döviz tevdiat Hesap No: 3138437

**Li Tirkiyê:** Mazhar Günbat

İş Bankası Cağaloğlu Şub. Şube No: 1095

Hesap No: 0408342

Ji kerema xwe re cihên li jor vala dagirin û tevî kopiyeke pelê razandina bedelê abonetiye bişînin.

**Navnîşana Welat:** Nuruosmaniye Cad. Atay

Apt. No:5 Daire No:14 Cağaloğlu / İstanbul

Tel: 513 34 33 Fax (Tel): 511 50 07

**Mercên abonetiye:**

	Li hundir	Li derve
3 meh	120.000	50 DM
6 meh	240.000	100 DM
12 meh	480.000	200 DM

# Kew, rovî, hirç û gur

1  
Zarokên Kurd jîr û agir  
Guh bidine çîroka gur

Bi gur re ew hirçê hovî  
Û ew xapînokê rovî

Li ser serê van kewên nêr  
Bi hev re dihejinin dêr

Ji dora Gola Wirmiyê  
Ta Zagrosan, serê çiyê

Ji wir ta Gola Wanê  
Heta Serhed û Botanê

Ji wir ta bi Feradê  
Dersim, Sêwaz û Amedê

Refek kewên gelek dijwar  
Ev axa zêr kirine war

Hêlin vedan niştêcih bûn  
Çiya ji wan re pêgih bûn

Başûr î wan hirçên hovî  
Li rojhilat hebûn rovî

Ji wan re bûne cîran  
Çav ber dane cihê wan

Lew axa wan pirr zengin e  
ser erd û bin erd zêrin e

Refek zertzûl ji rojava  
Li ber wan vedidin dawa

Êriş tên ji çar kenarî  
Reda wan nabin tu carî

Lew Egîd û cengawer in  
Bi çik û pirr bi huner in

Lê mixabin a serhişk in  
Ji hev re mîna dûbişk in

Ew tu carî li hev nakin  
Ji hev re çî bêtişaq in

Li ser axa ziv û zêr in  
Bi lîs û pêgih û hêlin

Jiyana xwe didomandin  
Hebûna xwe dihemandin

Sibehekê ew hemû kew  
çav vekirin ew rabûn ji xew

Nêrin ku ji Rojhilatê  
Dengê zur zura guran tê

Birrek gurê boz û birçî  
Guhbel, çavsor, terrîqemçî

Ketin nava erdê kewan  
Guh kerr dike, zur zura wan

2  
Ew kewên ribat û şervan  
Bi berxwedanê giran

Ew gurên birçî û çavsor



Avêtine pişt a sînor  
Gura nêriya ku bi şer  
Bi kewan re nabine ser

Hem bi lome û bi gazî  
Hem jî bi dek û fêlbazî

Ketine radorî wan e  
Bang kirin gotin: "Em biran e

Werîn em bi hevûdin re  
Êriş bikin van zertzûlan

Axa wan zeft bikin seranser  
Em bi hev re bikin par

Kewan bi wan re hilanîn  
Ji bona şer xwe pêk anîn

Ji guran re bûne leşker  
Bi qeqeq û bi fir û ger

Bi guran re li yek firê  
Gihan deşta Melazgîrê

Deşt ji zertzûla maliştin  
Hemû dan ber tîran kuştin

Kewan vekir riya guran  
Li cih û warê zertzûlan

Piştî zertzûl safî kirin  
Guran gotin: "Em xwediyê vir in

Erdê bav û kalê me ye

Mafê kesî lê tune ye"  
Êdî kew bûne palê xwe  
Ku biparêzin erdê xwe

Lê guran ew berdane hev  
Ji hevûdin qetiyan tev

Hinek bûn xulamê guran  
Hinek gihan hirçê Qurre

Hinek ketin siya rovî  
Ji eslê xwe man bêhêvî

Lê hinek ji kewên ribat  
Bi berxwedan û bi xebat

Serî hildan gotin: "Çima  
Çî wan zêde çî me kême?"

Yên ku pêşî li vir danîn  
Û pêk anîn şaristanî

3  
Xwediyê milk û rez û xerzan  
zevî û bostan û werzan

Ev çend hezar sal in em in  
Çawa em bin dest bikevin

Gur û hirç û wan dovîyan  
Li rewşa Kewan nêriyan

Dîtin ku ew nabin yek  
Bi fêl û hîle û dek

Dest avêtin axa kewan  
Lew êdî natirsin ji wan

Rahiştin tîr û rimê xwe  
Kew in, kirin bin tumê xwe

Bi saya wan kewê kêrî  
Kuştin yên ku hildan serî

Êdî dûr e gur û rovî  
Axa wan kirin binnê vî

Kew ketin rewşeke xedar  
Bûne dil, bêcih û bêwar

Ji dêla ku ew berê xwe  
Tev bidine neyarê xwe

Bûn dijmin û bi hev ketin  
Dûrî esil, bêxîret in

Dîsa hinek ji nêrkewan  
Li dora Cizîra Botan

Serî hildan, xwe dane pêş  
Lew dîlbûn bo wan bûye êş

Lê mixabîn weke her car  
Kewê xayîn pîs û neyar

Xwe dane aliyê guran  
Kuştin kewê serîhildan

Kewên ku hevbendên guran  
Ji guran re bûne bira

Tevan baskê xwe jêkirin  
Ew dibêjin: "Em jî gur in"

Qeqeq berdane êdî bûn gur

Dikin ewt ewt û zure zur  
Gur gelekî ser xwe ve çûn  
Gef didane gelê gerdûn

Geh rojava, geh li bakur  
Geh rojhilat, geh li başûr

Êriş berdidan cîranan  
Xof dikirin dilê wan

Cîran ketin rewşek nebaş  
Ji ber wan dane qaqa reş

Gotine hev: "Êdî bes e  
Em bûne dilên nekesan"

Gerdûn hemî li wan rabû  
Rewşa guran pirr xirab bû

4  
Gurekî har û tuzerî  
Xwe gihande kewê kerî

Got: "Ez ketim bextê we de  
Dijmin hatin bi ser me de

Hûn kew gelek merdemêr in  
Hûn baz û piling û şêr in

Ji bo me bibin alîkar  
Edî emê bibin hevpar"

Dilê kewan pê şewitî  
Dîsa tevan bi yekitî

Arî guran ketine şer  
Neyar hemû kirine der

Piştî serkeftina mezin  
Gur got: "Tiştêkî nexwazin

Hûn ne kew in mîna me ne  
Tenê hûn gurê çiya ne

Axa guran yek here tev  
Tu carî qut nabî ji hev

Xwezî bi wî ku bê ez gur im  
Yên ne bêjin wan didirrim"

Gur bang kir rovî û hirçan  
Axa kew kirin çar perçan

Dîsa kewên bi êş û jan  
Bi kulman li serê xwe dan

Gotin: "Êdî xweş xuya ye  
Ku bextê guran tune ye

Li Amedê, li Agirî  
Li Dêrsimê, li Qoçgirî

Kewê ribat bi lez rabûn  
Lê mixabîn dîsa têk çûn

Bi saya wan kewê kerî  
Pîs û xayîn, xwelî li serî

Lê nişkek kewê nû niha  
Bi wê axa xwe ve giha

Gur li dû wan bi zûre zûr  
Di kevîne teqana kûr

Gur nikare bi wan kewan  
Pirr nêzik e dawiya wan

# Problema girîng ya rewşenbîrên Kurdan e



Bedran Hebîb



Dr. Camşîd Heyderî



Firat Cewerî



Hüseyîn Kaytan



Zeynelabîdîn Kizilyaprak



Fehîme Karahan

Lêpîrsîna me ya li ser xwendina Kurdî didome. Vê hefteyê me berê pîrsên xwe dan ser kesên cur be cur. Du kes ji wan ji Başûrê Kurdistanê ne. Nêrînen kesên ku di vê hejmarê Welat de cih girtin pîr balkêş in. Di hejmarê pêşîya me de emê vê lêpîrsînê biqedînin, bes xwendevanên me dîsa jî dikarin dîtînen xwe ji me re bişînin ji bo ku di rûpelê 2. de bînin weşandin.

## 'SEXSIYET BI ZANEBÛNA ZIMAN Û ÇANDÊ VE GIRÊDAHÎ YE'

Bedran Hebîb

Li başûrê Kurdistanê pîrriya gel ji Kurdî pê ve bi zimane-kî din nizane û tu car zimanê Kurdî li Iraqê qedexa nebûye. Ji piştî Şerê Yekemîne yê Dinyayê ve heta îro kovar, rojname, kitêb bi Kurdî belav dibin, piştî şoreşa 1958'an li Iraqê, xwendin li başûrê Kurdistanê bû bi Kurdî. Min 12 salî zimanê Kurdî li xwendin-gêhê xwendîye. Lê divê bê zanîn ku ev tişt ne bi qenciya rejîma Iraqê çêbûye. Tevgera Kurd û ronakbîrên Kurd bi xebatên xwe pêk anîn, zehf caran nivîskarên Kurd kitêbê xwe bi pereyê berîka xwe diweşînin. Di vî 15 salî dawî de rejîma Iraqê dixwest ku hêdî hêdî xwendina Kurdî berteng bike. Zehfên xwendevanan bi Kurdî dixwînin, hin kitêbê Kurdî hene 10 hezar kopian 5 hatiye firotan, kovara Karwan (kovarek çandî bû, di navbera 1982-1991'an de derdiket) her meh 8 hezar kopî jê dihat firotin. Niha li Başûr xwendina li xwendin-gêhan bi Kurdî ye, lê kovar û rojname kêman xwendin. Ev jî, ji ber rewşa ekonomîya gel e.

Li bakurê Kurdistanê zehfî xwendevanan dibêjin, "Em bi Kurdî nizanin bixwînin". Rast e ev 70 sal e ziman qedexa ye. Gelek xwendevan bi zimane-kî din dixwînin, lê divê carekî din vegerin ser zimanê xwe. Divê xwe hîni xwendin û nivîsîna bi Kurdî bikin, netewetîya mirov girêdayî zimanê wî yê dayîkê ye.

Yekî ku bibêje ez Kurd im divê ziman û çanda gelê xwe bizanibe.

## 'ZIMAN MERCEKE XWENASIYÊ YE'

Dr. Camşîd Heyderî

Zimanê Kurdî li başûrê Kurdistanê di 50 salên dawiyê de gavên girîng ber bi zimanê standard û azadbûna zehfê axa Başûr, fersendeke baş ji bo zimanê Kurdî (zaravayê Kurmanciya Jêrîn-Soranî) çêbû ku, bi peyv û hevokên zaravayên din tê dewlemend kirin.

Ronakbîrên nûdem li Başûr girîngiyêke taybet ji bo zimanê Kurdî didin. Di dema şerê Iraq-Îranê de rejîma Iraqê zor da zimanê Kurdî. Digotin zehf peyvê Farsi di zimanê Kurdî de tên bikaranîn. Helbet piştî serhildan û azadbûna zehfê axa Başûr, fersendeke baş ji bo zimanê Kurdî (zaravayê Kurmanciya Jêrîn-Soranî) çêbû ku, bi peyv û hevokên zaravayên din tê dewlemend kirin.

Nezanîna zimanê Kurdî li bakurê Kurdistanê sebebên lojîkî jê re hene, ew jî qedexebûna zimanê Kurdî ye, ji aliyê rejîma Tirk ve. Helbet ew kes ku hişê neteweyî di dilê wî de heye, divê girîngiyê bide zimanê xwe, ji ber ku zanîna zimanê neteweyî mercê xwe nasîna neteweyê ye. Pêwîstiyêke neteweyî ye ku xwendevanê Kurd xwe hîni zimanê xwe bikin, her çiqas rewş jî ne musaid be.

## 'PROBLEMA GIRÎNG REWŞENBÎRÊN KURD IN'

Firat Cewerî (Berpîrsiyarê Giştî û Xwediyê Kovara Nûdemê)

Tirk di politikaya xwe ya asimilasyonê de tam bi ser neketin jî, dîsa bi sedhezaran Kurd asimilê bûne, ji zimanê xwe, kultura xwe, toreya xwe bi dîr ketine, bûne Tirk, an jî xwe mîna Tirkan dibînin, bi wê jî nayên ser, vîca Kurdan înkâr dikin, di politikaya xwe ya li dijî Kurdan de jî Tirkan tûjtir in; bi kurtî jî qirêl qiraltir in. Heçî Kurdên xwenas û têkoşer in jî, ji ber sedemên îdeolojîk û civakî, ji ber psikolojiya xwebiçûkdîtinê, an jî,

ji ber fanatîzma înternasyonalî, guh nedane zimanê Kurdî, zimanê Kurdî bêqîmet dîtine. Hema hema giraniya berhem û weşanên rêxistin û partiyên Kurdan bi Tirkî ne, ev jî tê wê maneyê, Kurdên ku hişyar dibin û li doza Kurdî xwedî derdikevin, bi zimanê Tirkî perwerde dibin, ji Kurdî bi dîr dikevin.

Ji bilî zor û zilma dewletê, sîcê me Kurdan bi xwe ye jî. Em ji bo bîdestxistina ziman û kultura Kurdî serê xwe didin, lê mixabin, em hewl nadin, an jî em hemû îmkânên xwe ji bo ziman û kultura Kurdî seferber nakin. Yanî ji bo ku em bikaribin hewesa xwendin û nivîsandina Kurdî zêde bikin, divê em Kurd tavilê an hemû weşanên xwe, an jî piraniya weşanên xwe bikin bi Kurdî, bi hev re bi Kurdî bipeyvin, li polîsxane û mehkemeyan bi înad ifadeyên xwe bi Kurdî bidin. Hingî ez bawer im, ne tenê zêdekirina hewesa xwendin û nivîsandina Kurdî ya li nava Kurdan, herwiha wê bibe destpêka çareserkirineke siyasî jî.

Em bîr ser pîrsa we ya duymîn. Ji xwe problema girîng problema rewşenbîrên Kurdan e. Bi Kurdî peyvîna gundiye-kî, karêkerê, şivanekî ne ewçend girîng e. Ya girîng bi Kurdîpeyvin û bi Kurdînivîsîna rewşenbîrên Kurdan e. Tevgera rewşenbîriya Kurdî jî her tim li derveyî sînorên Kurdistanê bûye.

Bi ya min, ji bo ku rewşenbîrên Kurd bigihîjin şexsiyeta xwe, nasnava xwe bi dest bixin û di nava rewşenbîrên cîhanê de mîna rewşenbîrên Kurd bi rûmet û serbilindî bişînin, divê ew tavilê li xwe vegehin, zimanê xwe hîni bibin, veşînin, bikin zimane-kî edebî û nemir.

## 'ÇIMA KURDÎ NAYÊ XWENDIN'

Hüseyîn Kaytan (Li ser navê kovara Rewşenê) Kurdî nayê xwendin.

Yek: Kurd di şer de ne, şer dom dike û weşanên me nagihîjin xwendevanan.

Dudo: Perwerdeya Kurdî tu-

ne ye, perwerdeyî bi Tirkî ye. Mirovê ku perwerdeyîyê bi Tirkî dibîne, huner û edebiyata bi Tirkî dixwîne. Divê weşanên me hem huner, hem edebiyat, hem zanîna bidin; hem jî, ji bo hînkirina zaravayên Kurdî bibin dibistan. Dibistaneke çawa? Wek dibistanên normal? Na. Wek dibistanên şoreşê. Çima? Ji ber ku rewşa me Kurdan rewşeke bêhtir taybetî ye. A ku di dilê gelê Kurd de xwestina huner û wêjeya bi Kurdî çêkiriye, şoreşa Kurdistanê bi xwe ye. Hînbûna zimanê Kurdî û hînbûna huner û wêjeya Kurdî, hînbûna çandê nû, tê maneya hînbûna şoreşa Kurdistanê. Em ziman hîni dikin, lê gel dixwaze zimanê şoreşê hîni bibe. Ev jî, tiştêkî taybetî ye û di nav şoreşê de mimkûn e. Divê berî weşanên Kurdî yê li Stenbolê, dibistanên Kurdî ên şoreşê li Kurdistanê bînin avakirin. Ev ava dibin jî; di gelek gundên Kurdistanê de gerîla ziman hîni dike, hîsa xwedibûna zimane-kî serbixwe diçe gel. Lê ne bes e. Divê ronakbîr mudaxale bikin, divê ronakbîr li Kurdistanê eger ne mimkûn e jî, ji Kurdistanê binivîsin.

Em li metropolê ne. Em çiqas behsa şoreşê bikin jî, xwendevan cihê me metropolî nas dike. Dîzane ku ev tiştêkî sînî ye. Xwestina xwendevanê Kurd, rojnameyên gerîla ne, rewşa gelê gundên li Kurdistanê ye, rewşa gelê li bajarên Kurdistanê ye. Kêmasiya me ev e. Ev kêmasî jî holê rabe, rewş wê jî nişkê ve ji sedî sed biguhere.

## 'PÊWIST E HÊZÊN BI TESÎR FÊRÎ GIRÎNGIYA ZIMAN BIBIN'

Zeynelabîdîn Kizilyaprak (Weşanên Pelê Sor)

"Rast e ku di van rojên dawî de pêwendî li ser berhemên (eser) Kurdî kêman bûye. Lê ev kêmbûna hanê, di paş hilberînekê de çênebûye. Ango, di salên borîn de berhemên Kurdî, ne ku bi Kurdî bûn, hatin xwendin, bêhtir di encama xwedîderketina hişên neteweyî de pêwend-

dî didit. Kurdî hêja negihîştîye xebitandineke giştî û hewisandineke baş. Ev berhemên Kurdî eger di salên borî de gelek hatin firotin, ji bo vê yekê bû. Sebebê vê yekê, rewşa gelê Kurd a li bakurê welat û zorîtiyên di nava dirokê de, xuya ne. Sebebê esasî ev e: Yanî tu dem bi serbestî xwendin û hewisandin mimkûn nebûye. Ji aliyê din ve, rojên gelê me, bi xwîn û can windakirinê re borîne. Gelê ku ji hêla fizîkî ve nikaribe bîhn bistîne, jixwe wext nabîne ku li ser girîngiya zimên raweste.

Yek jî sebebên ku ez pîr girîng dibînim ev e: Ronakbîrên bakurê welat di binhişîya xwe de herdem, vê yekê "Bi Tirkî û zimanê Tirkî re jiyîn mecbûriyet e" li ser xwe his kirine. Ev his li ronakbîran kiriyê ku "pîsporiyêke ekstra" çêbibe.

Xebateke pîr heye ku bê kirin. Di serî de; hêzên neteweyî yê bi tesîr, girîngiya zimane-kî Kurdî pêwîst e fêr bibin. Ji aliyê din ve mijarê tev bi hev re bifikirin û bi hev re tevger bikin."

## 'RONAKBÎRÊN KURD WEZÎFEYA XWE BAŞ NEANÎNE CIH'

Fehîme Karahan

Li gorî min ronakbîrên me heta niha wezîfeya xwe neanîne cih. Sedemê wê yekê jî bi du peyvyan nayê ziman. Ku ronakbîrên me wezîfeya xwe baş bianîna cih, ez bawer im ku emê niha gelekî din bi pêş ve biketana. Me dê dîroka xwe, çanda xwe, zimanê xwe gelekî din baş bizanibûya. Lê mixabin xebatên he-ta niha ku ronakbîrên me kirine, gelek kêman mane, têrî baş pêşveçûnê nekirine. Ronakbîr di nav gel de wek kevîrên bîngêhî in.

Ji bo pêşvebirina ziman jî divê ku em gelekî bixebitin, rojname û kovarên me, ji bo hînkirina zimanê nivîskî hê jî hêsantir bikin. Tu dibistanê me nîn in, divê rojnameyên me vê peyvirê jî pêk bînin da ku hinek be jî amadekariyêk ji pêşerojê re hebe...

Wê bidome



- Li ser navê ÎMC Basın-Yayın Ltd. Şti. (adına) Xwedî (Sahibi) Zübeyir Aydar
- Berpîrsiyarê Nivîsaran (Yazı İşleri Müdürü) Mazhar Günbat
- Navnîşan (Adres) Nuruosmaniye Cad. Atay Apt. No:5 Daire No:14 Cağaloğlu / İstanbul • Tel (fax) 511 50 07
- Berpîrsiyariya Ewrûpa • Postfach: 1531, 53117 Bonn 1, Germany • Tel: (49) 228-630990 (Navbera saet 11.00-16.00)
- Fax: (49) 228-630715
- Çapkirin (Baskı) Yeni Asya Matbaacılık • Belavkirin (Dağıtım) Birleşik Basın Dağıtım AŞ.